

Hefteya çuyî di nava galegalên derbeyê, êrîşên li ser sazîyên kurd û çalakiyên girseyî de derbas bûn.

Di rojeva çapemeniya tirk de, bi giranî ji nû ve derbe bû mijara sereke. Ev hefteyek e, di hemû sernivîsê rojnameyan û ekranên televîzyonê de gotinên Serokwezîrê Tîrkiye Mesut Yılmaz û Serkanê Giştî yê Artêşa Tirk İ. Hakkı Karadayı hene. Di şerê general û hikûmetê de, her rojnamegerekî/e tirk xwe da aliyekî. Hinekên dan zanîn ku, hikûmet nikare li gorî daxwazê, li hemberî "irtîca" yê şer bike, hinekên din jî gotinên Mesut Yılmaz derxistin pêş, ew wekî demokratekî nîşan dan.

Hate gotin ku leşker kirinên hikûmetê di cih de nabînin, lewre bi taybetî ANAP û DTP di qeyrana şarpeyê (turban) de, li dijî biryara MGK'ê derdikevin. Li aliyê din di qada navneteweyî de jî, hikûmet li gorî daxwaza leşkeran tevnagere. Generalan dixwest ku, di qeyrana kendavê de, hikûmet bi awayekî vekirî li nîk Amerîkayê cihê xwe bigirta. Dîsa ew dixwazin ku, hikûmet tîkiliyên xwe yê bi dewletên ewrûpî re germ bigirin.

Dîmabik r-3



Êrîşên derbexwazan, nikarin bibin asteng

Newroz bi girseyî

tê pîrozkirin

nevpeyvîna Helîm Yûsiv:

Helbestvan Mele Nûriyê

Hesarî

R. 8-9

Nirxandin:

Ji Newroza Kawa ta

Newroz Mazlum


R. 6

Vengûvaz:

Şarî tertele-yê Helepçe

lanet kerd

R. 15

Azadiya **WELAT**

SAMI TAN

Agirê Newrozê dê zora sar û seqemê bibe

Newroza îsal di navbera sar û seqemê de hat. Adarê dîsa rûyê werza nû yê nermik nîşanî me da û bi dûv re berf û baran li me barand.

Vê yekê hêviyên me yên ji bo sala nû û Newrozê kêr me kirin. Sala nû wekî sala yekîtiya neteweyî hate binavkirin, divê Newroza îsal jî li welêt û derveyî welêt şayanî ve salê bê pîrozkirin.

Sar û seqema van rojên dawîn, rewşa komara tirk tîne bîra mirov. Leşkerên tirk îcar, berê xwe dan hikûmeta ku bi destê xwe ava kirine. Ew hikûmeta ku wekî hikûmeta MGK'ê tê binavkirin jî bi kêrî leşkeran nehat, dîsa dest bi brîfîngan kirin.

Armanç diyar e; dagirker û împeryalist dixwazin, hêzên li dijî berjewendiyên xwe, li derveyî qada siyasî bihêlin. Ji bo vê yekê jî mijara sereke ya hemû brîfîngan "cudaxwazî" û "irtîca" ye. Lewre jî êrîşan dibin ser sazîyên kurd. Bo nimûne, dema ev nivîs dihat nivîsandin, hêzên dewletê avêtibûn ser NÇM'ya Beyoğlu, lêgerîn pêk dianîn.

Dema mirov li mijarê hûr nebe, mirov

nikare helwesta li hemberî derdorên îslamî fêr bike. Lewre piraniya derdorên îslamî, radibin rûdinin, pesnê artêşê didin. Yekî wekî Fetullah Gülen bi alîkariya MİT'a tirk li welatên cur bi cur dibistanan vedike, propogandaya tirkîtiyê misilmaniya tirkan dike, lê dîsa jî nikare xwe ji êrîşên generalan biparêze.

Sedem diyar e; hêzên îslamî nûnertiya birjuwaziyeke nûhatî, ku jê re dibêjin "taşra burjuvazisi" dikin. Pawanên mezin naxwazin ku bazara wan ji hêla wan birjuwayên nûhatî ve bê vegirtin. Sedema din jî, bîrdoza îslamî piştî hilweşîna pergala reel-sosyalîst bû dijbera sereke ya dewletên împeryalist.

Li aliyê din bîrdoza kemalîst, di rastiya xwe de tu caran nebû laîk, her tim dixwaze ol wekî çekê ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne. Divê bê gotin ku kemalîst li hemû bir û baweriyên; çî olî, çî jî siyasî bi vî çavî dinihêrin. Heke jê were dixwaze maksîstan jî bigire bin bandora xwe, heta radeyekê girtiye jî. Yanê divê hemû îdeolojî, "millî" bin, mohra tirkîtiyê li ser wan hebe.

Niha tevgera îslamî ne bi giştî be jî car caran ji kontrola rejîmê derdikeve, qet nebe sînyalên ve yekê dide, ew jî hêzên metinger pir ditirsîne. Her wiha ihtîmala bereyêke antî-faşîst û antî-împeryalist wan hê zêdetir ditirsîne.

Ji bo êrîşên li ser tevgera kurd zêde şîrove pêwîst nîn e. Lê di doznameya rayedarên HADEP'ê ya ku heftiya çûyî hate daxuyandin de, xalên balkêş hene. Parastina hebûna gelê kurd, ziman û çanda kurdî wekî cudaxwazî hatiye nîşandayîn. Ev jî nîşan dide ku di helwesta dewletê ya înkarkirina kurdan de tiştê neguheriyê. Digel vê helwesta hêzên dewletê jî, em bawer in ku wê Newroza îsal bi girseyî û çöseke mezin bê pîrozkirin. Cejna vejîna neteweyî Newroz pîroz be.

Wekî kurte-agahiyekê em dixwazin bidin zanîn ku cilda duyemîn a rojnameya me jî derket. Hûn dikarin ve cildê, digel cilda yekemîn, cilda Welatê Me û cildên Welat, ji rojnameyê peyda bikin.

Digel vê helwesta hêzên dewletê jî, em bawer in ku wê Newroz îsal bi girseyî û çöseke mezin bê pîrozkirin. Cejna vejîna neteweyî Newroz pîroz be.

Newroz dibe xerca yekîtiyê

Ferhengok

ayinî: olî, dînî	gernas
berg: qapax	maset: hol, rast
bijartin: hilbijartin	mergesat: karesat
bizav: tevger, hereket	mêjû: dîrok, tarîx
buwar: war, gorepan	ne asayî: awarte.
çak: baş, çê, qenc	(olağanüstü)
çavpêketin: hevpeyvîn	nexasim: bi taybetî,
çêj: tam	nemaze
cemawer: girse, (kitle)	nûser: nivîskar
ciyawaz: cuda, cihê	pîle: derece, rade
emro: îro, evro, îmro	pêşangeh: sergi
êsta: niha, nika, wêsta	ramyarî: siyasî
gewre: mezin, girs	ray: raman, dîtin
giyan: ruh	saw: tirs, xof
hergiz: teqez (ille)	seza: ceza
hewî: kuma	şadimanî: şahî,
hewngirî: rasyonelîzm	pirozbahî
hevçerx: hevdem,	tewan: karîn, şiyar
nûjen	tîpa kelîjandîne:
heyam: serdem	kaynaştırma harfî
îtir: êdî, hêndî	tomarkirin: qeydkirin
kam: kî	wate: mane, ango
karesat: trajedî	xewnerojk: xeyal
komelayetî: civakî,	xoşewîst: delal
sosyal	xwîner: xwendevan
kor: komîte, koro	xurek: xwarin
kutakirin: qedandin,	zankirin: eyerlemek
xelaşkirin	
kutahî: dawî	
lay: alî, hêl	
leheng: qehreman,	

ALAATTİN AKTAŞ

Di dîroka hemû gelan de, rojên serxwebûn û azadiyê, rojên rûmet û gernasîyê hene. Di bîngeha van rojên bilind de, hemû hêvî û mirad, huner û fedakarî, evîn û xweşikayî, zanist û hestên neteweyî hene. Ev roj, bi xwîn û can tene afirandin, di bin kaniya hêz û feyzê de, jiyan didin gelan û wan her dem jîndewar dikin. Ev roj, bi tîpên zêr dîrokê dineqîştînin; di bin giyanê jîyanê û di bin xerca yekîtiya neteweya gelan. Wê rojê, rûpelê dîroka koledarî û reşiyê hatibû girtin û roja rizgariyê tîrêjên xwe berdabûn ser Medya.

Girîngî û wateya Newrozê pir giranbiha ye, lewra gelê kurd bi Newrozê bûye gel û dewlet, bi Newrozê mohra xwe li dîroka mirovatiyê xîstîye û bûye xwedî welat. Belê, Newroz, roja damezirandina Medyayê ye; ew kaniya jîyanê, kaniya coş û morala neteweyî ye. Ew giyana rizgariyê, giyana gernasîyê û sembola serxwebûn û azadiyê ye. Her wiha Newroz, al e, kesk û sor û zer e; li ser bedena keç û xortên kurd tê pêçan û dibe vîna ji pola; wan bi cangorî dike çeper, ji bo parastina welat û parastina azadiyê. Newroz, zanista neteweyî ye; dost û dijminan, rastî û şaşîyan, xweşikahî û kerhiyan ji hev vediqetîne û bi mirov dide naskirin. Ev roja berz û

bilind, kaniya feyza pîşe û hunerên neteweyî ye; helbesta gernasî û azadiyê ye, di zimanê gelê kurd de. Newroz, agir e. Agirê yekîtiyê, agirê evîna neteweyî û welatparêziyê ye, di dilê keç û xortên kurd de. Newroz, roja şehîdan e; bicihanîna hêviyên wan û şadkirina giyana wan a bilind e. Lewra Newroz, berhema wan e. Wan Newroz bi can û xwîna xwe ya zelal kiriye roşana (cejna) pîroz. Êdî,

Giyana Newrozê, îro dibe xerca yekîtiya neteweya gelê kurd û di zimanê Serok de dibe banga Kongreya Neteweyî; ev bang û giyan gelê me ber bi îqfîdar û dewletbûnê ve dibe; sînorên mêtînger û împeryalîstan radike.

giyana Newrozê, giyana Mazlum û Mahsûman e. Zekiye Alkan xwe bi vê giyana bilind, di bircên Keleha Amedê de pêça û agirê Newrozê bi canê xwe xist. Piştî Rehşan, Ronahî û Bêrivan dane ser şopa Mazlum û Zekiye; ew jî bûne petal di dest û dilê gelê kurd de.

Şehîdan bi vî awayî, giyana gernasîyê, giyana rizgariya neteweyî dane Newrozê. Newroz, kirin jiyan û roja nû û di eniya Serokê Mezin de hilat; bû giyana şer, li dijî şexsiyeta kevin, li dijî şexsiyeta ketî ya bê vîn;

bû şer, li dijî tirsê, li dijî xwespartin û nokeriyê. Bi agirê Newrozê, ewil dijmin û kevnepereştiya di hiş û dilê kurdan de, ya di şexsiyeta de hate kuştin. Newroz bû giyanê artêşa rizgariyê û şerê çekdarî, bi vê giyana bilind, li seranserî niştîmanê bi pêş ket.

Îro Artêşa Rizgariyê bi giyana Mazlum û Egîdan, bi fermana Zilan û Rewşan û Bermalan, bi giyana Newrozê êrîş dike ser hêlinên xiyane-tê û kelehên mêtîngeriye kambax dike. Giyana Newrozê, îro dibe xerca yekîtiya neteweya gelê kurd û di zimanê Serok de dibe banga Kongreya Neteweyî; ev bang û giyan gelê me ber bi îqfîdar û dewletbûnê ve dibe; sînorên mêtînger û împeryalîstan radike û yekîtiya neteweya gel û welatê kurdan pêk tîne. Lewma îro kesên ku ji dil pîroziya Newrozê bike û bixwaze, pêwîst e mil bide dî-

ristkirina Kongreya Neteweyî û ji yekîtiyê, fedakarî û şervaniyê xwe nede alî. Wateya pîrozkirina Newrozê ev e. Pîvaneke welatparêziyê jî ev e îro.

Di Newroza nû de, gelê kurd wekî rojên Medya, dîsa dibe rêber û hêviya têkoşîn û rizgariya gelên Rojhilata Navîn. Şervanên azadiyê xwe bi giyana Hakî û Kemalîstan dipêçin û berê şoreşê didin Tirkiyeyê. Dîsa gelê kurd dixwaze, Newroza xwe bi gelên herêmê re par bike û bi hev re biratî û wekhevî ji kaniya rizgariyê ava giyana nû vexwe.

Êrîşên derbexwazan, nikarin bibin asteng

Newroz bi girseyî têt pîrozkirin

Destpêk r-1

Li gorî daxuyaniyan, leşkeran nerazîbûna xwe li hemberî nêzîktêdayîna Yılmaz a li hemberî Almanayê diyar kirine. Hikûmet dixwaze têkiliyên xwe bi dewletê Rojhilata Navîn re baştir bike, ew jî bi dilê generalan e.

Li hemberî kesên ku dibêjin, mafê leşkeran tune ku têkilî karê siyasî bibin, têt gotin ku Qanûna Bîngehîn a ku cuntayê amade kiriye, rê dide vê yekê û jixwe hikûmeta Anasol-d jî berhema destkariya leşkeran e.

Li gorî nîrxandinên siyasatmedarên ji derdorên cuda, niha Amerîka û leşkeran hêviya xwe ji hikûmetê birîne. Lewre leşker êdî gihîştine vê baweriyê ku, partiyên ji baskê rastgir nikarin, bi ser hêzên îslamî de biçin. Niha dixwazin hêzên çepgir derxin pêş. Hêza ji bo vê yekê jî wekî CHP'ê derdixin pêş.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî hefteya çûyî di bernamêya "Panel" a MED-TV'yê nîrxandineke bi vî rengî kir: Öcalan da zanîn ku Amerîkayê dîtîye ku hikûmet nikare li dûv daxwazên wê bimeşe, lewre jî bi riya leşkeran dest avêtîye meseleyê. Li gorî Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan, Serokê CHP Deniz Baykal ew yek dîtîye, lewre jî xwe ji bo desthilatdariyê amade dike.

Bûyerên çend mehan nîşan didin ku, hikûmet di êrîşên li hemberî saziyên kurd de gelekî jêhatî ye, ji cejna Remezanê bi vir de, navenda giştî jî di nav de bi dehan avahiyên HADEP'ê bûne êrîşên hêzên dewletê. Di serî de Serokê Giştî Murat Bozlak, gelek rayedar û endamên partiyê hatine binçavkirin. Heftaya çûyî doznamêya (îdianame) doza rayedarên HADEP'ê hate daxuyandin. Li gorî dozgerê DGM'ê, rayedarên HADEP'ê her tim qala hebûna gelê kurd kirine, qala cudabûna

Heftaya çûyî li aliyekî galegalên li ser derbeyan û li aliyekî jî amadekariyê ji bo Newrozê hebûn. Leşkeran helwesta hikûmetê ya li hemberî derdorên îslamî baş nedît û jî nû ve dest bi brîfîngan kir. Li aliyê din çalakiyê girseyî yên derdorên demokratîk û êrîşên hêzên dewletê yên li ser derdorên demokratîk domiyan.

çand û zimanê wan kiriye, bi vê yekê jî cudaxwazî kiriye. Li gorî doznamêyê çî kesê ku çêlî hebûna kurdan bike, divê bê girtin.

Heftaya çûyî jî hêzên dewletê avêtin ser gelek, saziyan û gelek kes girtin binçav. Roja 19'ê adarê saziyên wekî NÇM, Ûlkede Gündem, Göç-Der, Özgür Halk, Yurtsever Gençlik û DBP û gelek şaxên HADEP'ê bûn hedefa cerda hêzên dewletê. Di van cerdan de gelek kes hatin binçav kirin. Li gorî agahiyên bi dest ketine, 60 endamên komîsyona ciwanan a HADEP'ê hatine binçavkirin. Her wiha di cerda li ser Ûlkede Gündemê de jî Berpirsê Karê Nivîsaran Hayrettin Demircioğlu û xebatkarên rojnameyê Bengi Yıldız, Hüseyin Turan, Kemal Selçuk hatin binçavkirin. Her wiha têt gotin ku polîsan avêtîye ser Kampûsa Göztepe ya Zanîngeha Marmarayê û li dora 60 xwendekarî girtine binçav.

Tevkuji hatin lanetkirin

Tevî wan êrîşan jî girseya kurd dest ji çalakiyên xwe berneda. Heftaya çûyî ji bo protesto kirina tevkujiya Helepeçeyê û tevkujiya 16'ê adarê li Meydana Beyazîtê bi qasî du hezar kes gihîştin hev û ev her du tevkuji lanetkirin. Komîteya Bibîranîna Tevkujiya Helebçe û 16'ê Adarê

daxuyaniyek da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de hate gotin ku, ew tevkuji li cihên ji hev cuda pêk hatine li kiryarên wan yek in. Hate gotin ku hêzên faşîst û împeryalist berpîrsên wan tevkujiyan in. Di xwepêşandanê de sloganên wekî "Emê hesab bipirsîn!", "Li dijî faşîzmê mil bidin hev!", "Me 16'ê adarê û Helebçe ji bir nekiriye û em ji bir nakin!" hatin avêtin. Digel rêxistin û komeleyên xwendekaran, partiyên wekî HADEP, SİP, ÖDP û EMEP'ê jî piştigirî da vê çalakiyê.

Newroz bi girseyî têt pîrozkirin

Partiyên dijber ên wekî HADEP, SİP, EMEP û ÖDP'ê roja 19'ê adara 1998'an li Türk Tabibler Birliği civîneke çapemeniyê li dar xistin. Serokên wan partiyên ên şaxên Stenbolê dan zanîn ku, ew dê Cejna Newrozê bi hev re li Meydana Zeytinburnu ya Kazlıçesmeyê pîroz bikin. Li gorî daxuyaniyê, wan ji bo destûrê serî li walîtiyê dane, lewre ew dixwazin pîrozbahî bi awayekî serbest û girseyî pêk were. Piştî wan gotinan serokên şaxên Stenbolê yên wan partiyên dîtî û ramanên xwe li ser Newrozê vegotin.

Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar: "Newroza ku cejna berxwedan û azadiyê ye, wê dişa şayanî naveroka xwe bê pîrozkirin. Ew bi têtîşîna gelê kurd bû cejn, dewlet hem dixwaze wê fermî bike, hem jî ji bo ku neyê pîrozkirin êrîşan pêk tîne. Rêveberê EMEP'a Stenbolê Seyit Aslan: "Em dixwazin ku dawî li çewsandinên li ser gelên Rojhilata Navîn bê û agirê Newrozê hê gurtir bibe. Newroz bi serbestî û serfirazî bê pîrozkirin." Endamê Meclîsa Partiya SİP'ê Yalçın Oral: "Ez têtîşîna neviyên kurdên ku li dijî Deheqê zalim şer kiribûn, silav dikim. Emê piştigiriyê bidin sembola hêz û şiyana kedkarên kurd û tirk."

Serokê ÖDP'ya Stenbolê Mehmet Atay: "Dewlet cejna kurdan Newrozê wekî sendromekê pêşkêş dike, her wekî çawa di cejna 1'ê gulânê de hinek daxwazên me hebûn, di Newrozê de jî daxwazeke me heye; ew jî aşî ye."

NAVENDA NÛÇEYAN

Kurtenûçe

Di GM'ya Stenbolê, salek cejna li nivîskar û helbestvan û edîtorê Ûlkede Gündemê Hüseyin Karataş birî. Karataş, ji ber pirtûka xwe "Strana Serhildaneke Dêrsim" hate darizandin û bi cudaxwaziyê hate tawanbarkirin. H. Karataş wê di Girtîgeha Paşakapısıyê de cezayê xwe kuta bike. Li aliyê din, Helbestvan Can Yücel jî ji ber ku heqaret li S. Demirel kiriye bi salek û du mehan hate cezabarkirin. Dişa salek cezayê rêvebera Navenda Giştî ya Egitim-Senê ilk-nur Birol, ji ber ku heqaret li Mehmet Açar kiribû, hate erêkirin.

Piştî ku hêzên tirk ji herêma Bestayê vekîşyan, encamên nû yên operasyonan derdikevin holê. Piştî daxistina helikopterekê hate ragihandin ku, 30 leşkerên ku di ser de birîndar bûne, li nexweşxaneyên Şernexê tene tedawîkirin. Wekî din ji bo tedawiya leşkeran ji nexweşxaneyên dewlet û leşkerî yên Amedê û ji Nexweşxaneyê Zanîngeha Dicleyê gelek doktor hatine Şernexê. Li hêla din nexweşên sivil diyar dikin ku, ji ber ku leşker hatine, ew nikarin tedawî bibin.

Roja 17'ê adarê li Batmanê, di êrîşên bi çek de 2 kesên ku li derdorê wekî endamê Eniya İlimê ya Hizbullahê tene binavkirin, hatin kuştin. Pêşin êrîş li ser kolana SSK'yê pêk hatiye û xwediyê pirtûkxaneyê İslamê Akın Uygur hatiye kuştin. Her wiha hevalê wî Faruk Kardaş û Davut Kersinê ku bi rê ve diçûye birîndar bûne. Di êrîşa duwem de, ku 300 metre ji êrîşa berê dûr bûye de jî, ji xebatkarê heman pirtûkxaneyê Mehmet Dal hatiye kuştin.

Çigirê Serokê Giştî yê İHD'yê Osman Baydemir, der barê serlêdan û encamên ku di 5 salan de, li İHD'ya Amedê hatine kirin de daxuyaniyek da. Bi pey agahiyên Baydemir, ji sala 1992'an heta sala 1997'an ji 10 hezarî bêhtir serlêdan ji bo wan hatine kirin. Baydemir da zanîn ku, wan 137 doz birinê Dadgeha Ewropayê ya Mafên Mirovan, ji 4 dozan Tirkiye mehkum bûye û dibe ku di 50 dozên din de jî Tirkiye mehkum bibe.



Leheng û dîrok

Lehengên gelê kurd, ew kesên ku navê wan di hişê her kurdekî dilsoz û xemxwar de hatiye tomarkirin, ew ên ku dîrokê bi xwîna xwe dinivîsinin, ew ên ku di zindanan de, di mercên çetin û dijwar de li ber xwe didin, ew in lehengên gelê kurd.

Her roj dayik lehengan naynin. Her roj leheng çênabin. Lê di nav pêlên demê de, hin caran mirovin di nav welatîyên xwe de derdikevin, wekî stêrkên geş in di welatê xwe de. Welatîyên wan, li ber tirêjên ronahiya wan, pêş xwe dibînin û li gorî wê ronahiyê dilivin... Mirov dikare ji yê wê wêkî wan mirovan re bibêje, leheng.

Mirovên leheng, di hemû heyaman de hene û di hemû heyaman de derbas dibin. Welatîyên wan, yê hevçerx, li ber tirêjên ronahiya xebat û bizavên wan, pêş xwe dibînin û di rêçikên rast û durist de dilivin. Ew rêçikên ku tevahiya xweşî û geşiya gel di wan de kom dibe.

Ew in, yê ku dîroka gelê xwe çêdikin. Çêkirina dîrokê qedera wan e, li ser eniya wan hatiye nivîsandin.

Belê, dîrok jî, ne gola ye, dîrok jî pişê û sazên mirovên leheng li teraziya xwe baz dibe. Teraziya dîrokê jî, biryara gel e, biryara gel jî, ji ber xwe ve nayê holê ku, ne ji bo payebûn û serbilindahiya navê welat û pêşketina gel be. (Kî bin ew mirovên leheng û ji kîjan welatî bin).

Mirovên leheng, ew mirovên ku xwîn û temenê xwe di ber bîr û baweriyên xwe de xerc dikin. Bi tev heştê xwe

bizav û xebatê di ber welat û welatîyên xwe de dikin. Bê ku haya wan ji dîrokê hebe an di dîrokê de li navê xwe bigerin.

Lê karê dîrokê jî, parastin û tomarkirina bizav û çalakiyên mirovan e, çî ew bizav û çalaki çak bin, çî xerab bin, dawî tev li ser navê xwediyên xwe tên tomarkirin û di nav gel de dimînin ta bi axira zemên.

Ez ne bawer im ku, tu carî gel lehengên xwe ji bîr bike, nexasim ew ên ku di tengayê de xwîna xwe rijandibin, di nav zinar û latên welat de, di ber xweşî, geşî û pêşketina gelê xwe de û di mercên çetîn û dijwar de desthilanî bin ji bo serxwebûn û serfiraziya welatê xwe... Ez ne bawer im ku, tu gel di cihanê de wan mirovên xwe ji bîr bike, ew mirovên ku hema carekê tenê gotineke xweş an carekê çak ji gel re an di ber gel de kiribin û gelê wan sûde ji wê gotinê an wê çakiye dîtibin.

Mirovên leheng, di jiyana xwe de nefisbiçûk in, dilovan û mirovhez in û her dem li dijî sitemkariyê radiwestin. Vêca dema ku lehengek koç dibe, gelê wî lehengî, konên şîne vedigire, alên xwe xûz dibe û pê re pê re çavên xwe li lehengekî nû digerin, ku şûna lehengê

koçkirî dagire.

Lê her roj dayik lehengên gelê kurd, ew kesên ku navê wan di hişê her kurdekî dilsoz û xemxwar de hatiye tomarkirin, ew ên ku dîrokê bi xwîna xwe dinivîsinin, ew ên ku di zindanan de, di mercên çetin û dijwar de li ber xwe didin, ew in lehengên gelê kurd.

Mirov ji ber xwe ve nabin leheng. Gel jî mirovên ne leheng nake leheng. Heger teraziya dîrokê gel e, teraziya gel jî ji zêre, gel bi xwe teraziya xwe ya zêrîn, ku tu carî zingar nagire, lehengên xwe dibijere û bi navê wan di bîr û ba-



weriyên xwe de tomar dibe û bi demê re xebat û bizava wan jê re dibe dîrok û cihê pesin û serbilindahiyê...

Ne gerek e, ez navên lehengên gelê kurd bibêjim, lehengên gelê kurd, ew kesên ku navê wan di hişê her kurdekî dilsoz û xemxwar de hatiye tomarkirin, ew ên ku dîrokê bi xwîna xwe dinivîsinin, ew ên ku di zindanan de, di mercên çetin û dijwar de li ber xwe didin, ew in lehengên gelê kurd, rûpelên dîrokê jî li ber wan vekiriye.

KONÊ REŞ

Dilekî mişt zarok: Astrîd Lîndgren



Ne bi tenê xewn û xeyalên zarokan dewlemend dibe, bi Nexweşxaneyê Astrîd Lîndgrenê sihetê jî belav dibe.

Nivîskara Swêdî Astrîd Lîndgren, heta niha bi dehan pirtûk nivîsîne. Pirtûkên wê, bo gelek zimanan hatine wergerandin. Ne tenê li Swêdê, li gelek welatên din jî, wê, cihê xwe dilên zarokên cihanê de çêkiriye. Bi cîhana xwe

ya fireh, xewn û xeyalên wan bi reng kirine. Lîndgren, di nav kurdan de bêhîr bi pirtûkên xwe yê bi navê 'Pîpî goredirêj' tê nasîn.

Belê, we rast xwend, nivîskara hêja ne tenê bi çîrokên xwe, xewn û xeyalên zarokan dewlemend dibe. Ji bilî wê, ji niha û pê ve bi nexweşxaneyê xwe ya bi navê Nexweşxaneyê Zarokan ya Astrîd Lîndgren "Astrîd Lîndgren Sjúkhus" dê sihetê (tendirustî) jî belav bike.

Nexweşxaneyê Lîndgrenê, li Stocholmê ye. Beşên wê, ne li gorî temenê (emrê) zarokan, lê li gorî nexweşiyên jî hevûdu hatine veqetandin. Bi vê yekê, xebatkarên wir, dê li ser nexweşiyên baştir kûr bibin û zaniyariya (agahî) her nexweşiyekê li cihê bicîvinin.

Her devereke lînerînê, du cihên (do-

Nivîskara Swêdî Astrîd Lîndgren, heta niha bi dehan pirtûk nivîsîne. Pirtûkên wê, bo gelek zimanan hatine wergerandin. Ne tenê li Swêdê, li gelek welatên din jî, wê, cihê xwe di dilên zarokên cihanê de çêkiriye.

şek) wir hene. Yek ji bo zarokên nexweş, ya din jî, ji bo dê û bavên wê/wî ye.

Bi alîkariya wênekêş û hunermendên din, jûrên (odeyên) nexweşxaneyê, xwezahiyê rengîn wergirtine. Kesên nexweş, xwe ne li nexweşxanê lê li beşeke bihuştê razayî hîs dikin.

Di nexweşxaneyê de, bi tevayî 1200 kes dê kar bikin. Ji bo dermankirinê, cihê 170 zarokan hene. Ji bilî wê, beşa nexweşên xedar jî heye, ku li wir, di her saeta rojê de dikarin têkevin bin kontrolê.

Astrîd Lîndgren: Di sala 1907'an de, li Swêdê, li Vimmerbyê hate dinyayê. Dê û bavê wê bi çandiniyê dadiketin. Piştî xwendina seretayî li Stocholmê, li zimên hûr dibe.

Piştê perwerdebûna sekreteriyê dix-

wîne. Di navbera salên 1946-1970'an de di weşanxaneyê bi navê deng, Raben&Sjögrenê de redaktoriya pirtûkên bo zarokan dibe.

Pir xelat wergirtine. Hinek jê ev in: 1957, xelata pirtûkên ciwanan li Almaniyayê "Sonderpers", Madalya zerîn ya Akademiya Swêdê 1971, 1973 doktoreya şerefê ji Unîversîta Linkopîngê, 1974 xelata hezkiriya zarokên polonî, 1978- xelata nivîskarên navneteweyî "International Writer's price".

Hinek ji pirtûkên wê ev in: Pippi Långsturep. 1945 (rêze pirtûk), Alla vi barn i Bullerbyn- 1947, Mösterdedektiven Blomkvist-1948, Katii Amerika-1950 (rêze pirtûk), Lillebror och Kralsson pa taket-1955, Rasmus, Pontus och Toket-1957...

GABAR ÇIYAN

Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 3 -

Tipên kelijandinê

Sedemeke din a ku, divê mirov li ser mijara peyvên ku bi tipên dengdêr dest pê dikin jî, raweste ev e; di kurdî de dengdêr li pey hev nayên. Dema ku du dengdêr tîn ber hev, tîpeke kelijandinê dikeve navbera wan. Sê dengên ku bi vê peyvirê radibin hene: /y/, /w/ û /h/. Ew her sê deng wekî niv-dengdêr tîn binavkirin. Jixwe ew her sê deng, li gorî dengdarên din, bi hêsanîtir ji devê mirov derdikevin, li cihêkî naeliqin. Ji bo nîşandayîna rola wan tîpan mirov dikare çend nimûneyan bide:

/H/ Avahî, ronahî, şinahî, perwerdehî, xwezahî,

/Y/ rûyê min, xwezayî, bi vî awayî, piyê min, siya te

/W/ Ruwê me, xwesiwa te, Cîzrawî, kawî

Lê dema hinek peyv bi dengdêrê dest pê bikin, ev rêpîvan (qaîde) di hin rawe û dema de bînpê dibe. Ango dema hinek lêker li gorî dema û raweyan saz bîbin, du dengdêr tîn ber hev û mirov nikare tîpeke kelijandinê jî bixe navbera tîpan.

Mirov dikare bi çend mînakên vê rewşê nîşan bide:

înan (anîn) biîne (raweya fermanî)

Êşîn diêşîne (dema niha)

Ewr biewr (wekî rengdêr)

Avêtin biavêje (raweya fermanî)
Ajotin naajo (dema boriya berdest, awayê neyin)

Ji ber vê yekê, meyla zimên ber bi vê yekê ye ku, ji vê aloziyê rizgar bibe û xwe hêsanîtir bibe. Her wekî ji mînakên jor jî xuya dike, di hinekan de dengê ku bi domana demê re ji holê rabûye, ji nû ve derdikeve holê. Bo nimûne "înan", di dema niha û raweya fermanî de dibe "di-hîne", "bihîne". Ew şewe ji hê kurtir dibe û teşeya "tîne", "bîne" digire. Her wekî tê dîtin, di dema niha de /d/ dibe /t/. Ew hêsanbûna peyvên, di gelek mînakên din de jî balê dikişîne:

Biaqil/baqil

Diavêje/ davêje (tavêje)

Biajo/bajo

diêşîn/ dêşîne (têşîne)

Tipa dubare

Taybetiyeke din a zimanê kurdî jî ew e ku, di kurdî de "şedde" nîn e. Yanê tu tipên ji hev û nêzî hev nayên ber hev. Ew yek ji aliyê piraniya zimanzanên kurd ve tê zanîn û pejirandin, lê dîsa jî hinek ji bo nîşandayîna /r/ û /l/ ya stûr van tîpan dubare dikin. Bi vî awayî vê rêpîvanê bînpê dikin. Li aliyê din, di hinek peyvên biyanî de jî, tîpa dubare heye û ji bo parastina reseniya peyvê tîpa dubare tê bikaranîn. Tevî ku di peyvên kurdî yê resen

de tîpa dubare tune jî, di hin peyvên hevedudanî de û pileya duyemîn a rengdêran de û hin rewşên din de du tipên ji hev li pey hev tîn.

Celadet Bedirxan, dixwaze ku ji du tîpên wekî hev an jî nêzî hev yek bê xistin û peyv bi tîpekê bê nivîsandin. Ew, ji bo ravekirina vê rewşê, di pirtûka xwe ya bi navê "Bingehên Gramera Kurdmancî de" wiha dibêje: "Di zimanê kurdmancî de tîpa dubare nîn e. Ji lewre, heke di bêjeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan ji ber xwe de dikeve û tîpek bi tenê dimîne." Piştê jî ew mînakên li xwarê dide:

xurt xurt-tir xurtir

rast rast-tir rastir

kurt kurt-tir kurtir

paş-şiv paşiv

baş-şev başev

yek-kîte yekîte

Ji bo tipên nêzî hev

rind-tir rintir

pişt-dawî pişdawî

dewlemend-tir dewlementir

Mirov dikare çend mînakên din jî bi de wekî

Şerrawestandin

Serokkomar

Yekkerî

Terkkirin

Lê ew rêpîvan hin caran alozî û astengiyên derdixe pêşberî mirov, ji ber vê rê-

pîvanê, mirov nikare du peyvên ji hev derxe. Heke li gorî vê rêpîvanê bê nivîsandin, mirov nikare şerawestandin (şe-rawestandin) û şer-rawestandin, terk-irin (şilkirin) û terk-kirin (terikandin) ji hev veqetîne. Di rewşên wiha de, azîneya herî bikêr, ew e ku, mirov tîrekê bixe navbera her du hêmanên peyvê û wekî "terk-kirin, şer-rawestandin" bînivîse. Jixwe tu rêpîvan, bêyî awarte nabe, lewre wê awarteyên vê rêpîvanê jî her hebin.

Hinek zimanzanên ku li dijî vê rêpîvanê radibin jî hene. Ew kes didin zanîn ku, divê koka peyvê bête parastin. Xuya ye ku, dema mirov li gorî vê rêpîvanê biçe, koka gelek peyvên diguhere. Her wiha ev rêpîvan, di warê perwerdehiyê de jî karê mirov hinekî dijwartir dike. Lê divê mirov ji bîr neke ku ziman jixweber xwe hêsan û sadetir dike. Heke mirov li gorî vê rêpîvanê bînivîse, dibe ku bi domana demê re koka peyvên navborî jî biguhere. Her wekî çawa ku "havêjtin" bûye "avêtin", dibe ku "dewlemend" jî bibe "dewlemen".

Di dawiya vê waneyê de, me divê ku em qala yekemîn nameya li ser waneyan bikin. Birêz Hiseynê Îzarî, di nameya xwe de, balê dikişîne ser pêwîstiya nîşandayîna rengdêran bi alîkariya biçûk û zêzekê. Kovara Sirwe ku li Rojhilat derdikeve, biçûk danîna ser gelek tîpan û tipên 'h', 'x', 't', 's', 'é', 'î', 'î', 'r', 'û', 'l', 'k', 'c', 'p' afirandine. Lê bi awayî hejmara tipên alfabea kurdî bûye 45.

Helepçe ji bo kurdan peyamek e

MEDENÎ FERHO



Jiyaneke bêtengasî, ku mirov li gorî dilê xwe tê de bilive, gotin û galgalên xwe bêtirs tê de bibêje, angî bi raman û hewngiriya xwe di nava tevgera civakî de cihê xwe bigire... Bêcendirme!... Bêqirîn û hawara jinan!... Bêwawêylê û dilojarêya jinan ku piştî agir barana balafirên ji nişkê de ezman û erdê dikine nava lerizandinê!... Bêyî bêhn û bixara toza têr şewat û jehfî!... Ku bi navê ol û mirovaniyê tê reşandin!... Bêyî giriya zarokan, ku hêstir û dengê bêzarî û neçariyê di nava hevûdin de tê pêçan! Toza ku di nava ronahiya rojê de xal dide, ji kirasekî dikeve kirasekî din û li nava ser û guhên mirovan dikeve.... Mîna qotikê, qir dike... Mirin xweş e, mana piştê merezoşî, îledarî, têr nexweşiya kurmî ku bêderman e. Bi salan û bi nîşan didomîne... Bi saxîti mirina kurmî û tengezarî.. Kula çirîzokê bikeve mala xayîn û bêbextan!..

Bêguman ji her kesî bêhtir, kurdan navê mirinê bi dilojarêyî bihistine, cureyê mirinê nas kirine. Bêhtir ji her xaka cîhanê,

Kurdistanê goristan dîtine. Bêhtir ji her xakê, mirovên cur bi cur di nava axa xwe de veşartine. Lewre kulîlk û gulbijêrkên vî welatî rengîn in, bi xeml û xemgîn in. Cemawerên ku birîn û xizaniya xwe bi van gul û gulbijêrkên, bi reng û xemla kulîlkan, di nava hûnandina stran û dîlok û govendên xwe de, ku her sed salî bi keleh û bircên komkujiyê jîndar kirine gelekî kêr in. Ku wêjeya xwe li ser bêzarî û neçariya têr tengezarî avakirine, li ser cîhana gewrik peyda nabin. Jiyana ciwanîk berê xwe guhertiye. Lewre kurd, her bûyer û pêhatî bi çarenûsî berhembêz kirine. Erdeke hişk û ezmanekî bilind.

Meha adarê ku ne zivistan e û ne bihar e. Lê, cejna pîroz ku cardin bi agir û pêt û rimîya agir bûye, nîşaneyê serfirazî û berxwadanê, di vê mehê de cardin para cemawerê kurdan ketiye. Û toza kîmyewî, di nava ronahiya Şeşimsa Siltanê şeş rojan de, ku ji rengê dikete rengê din, berî deh salan wekî îro, sala 1998'an, 16 adarê berî cejna pîroz bi pênc rojan, pênc hezar mirovên kurd, qijilandin. Ne mirov bi tenê, ne zarok û jin, kal û xort tenê, karik û berxik, pez û dewar, giya, kulîlkên darê behivan ku nû nû dipişkivîn, ajda û çavikên şax û çiqliyên daran ku nû nû ber bi jiyane ve çavên xwe bel dikirin... Kîşumat korkirin, şewitandin. Hawariyên mafê mirovan, pehlewanên bi navê demokratîyê bang dikin, parêzgerên ol û toreyên xwedayî, di encameke pir balkêş de, ku teva tawanbarên vê komkujiyê ne. Bi

giştî teva!... Cîhan, vê der barê de ker û lal bûye, teva!..

Gelo çima ku doza kurdan tê masetê cîhan felcbûyî ye, di encameke dilehayî de dimîne?

Piştî komkujîya Helepçe bi deh salan, ji nû ve van hawarî û pehlewan û parêzgeran, destên xwe dirêjî bûyer û pêhatiya rûşeya mirovaniyê dikin. Gelo çima ewqas dereng!.. Her wiha, zanistên genetîkî rê digirin diçine Helepçe, li ser bûyer û pêhatiya mezin û bandora toza kîmyewî, li ser cemawerên herêmê lêkolîn û lêgerînan dikin. Di kanalên telewîzyonan de, bang li cemawerên cîhanê dikin, piştigiriyê dixwazin. Piştî ewqas sal û derengmaneke seyr, ev nêzîkahî çima? Bi rastî ev tevger, pir tîştan tînine bîra mirov. Berjewendiyên Amerîka û Ewropa, kurdan di Rojhilata Navîn de mîna piyonan bi kar tînin. Muxalefeta kurdan, nikare dewsa Saddam û valahiya piştî wî jî dagire. Hêza kurdan û muxalefeta din ya hemberî Iraqê jî nikare bi hêzên Saddam. Ewropî û Amerîkî vê çendê xweş dizanin. Wekî din!..

Dijmin jixwe dijmin e. Lê kurd çima bi xwe agahdar nabin û di rewşa cîhanê nagihêjin? Piştî Helepçe, ku wekî Hiroşîma û Nagazakiya duyem tê hejmartin... gelo çima!.. Helepçe ji bo kurdan peyameke Xwedahî ye, ku hêz û cemawerê sivîl, bi giştî li xwe vegerin, li hev werin û yekîtiya xwe damezrînin. Hêz û cemawer teva êdî têgihîştine ku, dostê kurdan bes kurd in. Bêyî yekîti û hevkarîyê jî tu encam jî nayê standin.

Ji Newroza berxwedana Kawa ta Newroza mirovatiya Mazlum

Roja derketin û belavkirina Zeredestiyê wekî bîrdozekê bû ji bo medan.

21 adarê, derketineke nuh nîşan dide, zayîneke nuh dide berçavan, ev bi xwe jî encama gelek salan û serencama vê zayînê jî roja 27 mijdarê sala 1978 dawiya vê pirsê bû. Ji ber ku ew mêjû destpêkirina bîrdoza serxwebûnê û azadiyê bû.

Dîrokê, pir roj di jiyana gelan de mayinde hiştine. Ew bi xwe rojên zehmetiyê bûn, rojên ronahîbûnê, rojên girîng bûn. Yek ji wan rojan, roja Newrozê ye; roja 21 adarê ye. Wê rojê bi xwe gelê Kurdistanê derbasî bajarvaniyê kiriye, derbasî ronahiya dîrokê kiriye. Newroz roja berxwedanê, roja hişyarbûnê ye. Ew roja hişyarbûna ji xewa kûr û dirêj û roja azadiya piştî koletiyê û berxwedana piştî xwespartinê ye.

Newroz roja destpêkirina biharê ye, roja vebûna gul û beybûnan e, roja germbûna piştî serma zivistana sar û sir e. Her wiha ew roj e ku, jiyana bi ser dikeve û xatirê xwe jî mirinê dixwaze. Ew evîna nava dilê dildarên welatê min e, mîzgina rojên nuh e, nîşana serkeftina jiyana ye di Kurdistanê de. Ev e ji helikê ve û ji hêlek din ve, dimîne ku, hin kes aşiqê mij û dûmanê ne, aşiqê sawir û xewnerojkan in, aşiqê xwexandandinê ne... wekî pêçemûkan bi şevê difirin, nikarin berê xwe dibin ronahiya Newroz e. Ev in rojên gelê min di dîrokê de.

Îro, em dîsan berê rojê azad û serbixwe û ronak. Piştî 2610 salan, ji nuh ve, em di vê roja Newrozê de şadîmanî, niyê çêdikin û pê şadîbin, ji ber ku Newroz di xebare de gelek manayan di nava xwe de, hildigire. Û ji bo têgihîştin û fêmkirina pirsê neteweyî û mirovatiyê dil û mejî karigertir dike. Naskirina dîroka xwe ya kevn û nuh a tê xwestin. Nasnekirina dîrokê, di yek demê de, nasnekirina pêşerojê ye.

Newroz, serkeftin e di şerê hebûn û nebûnê de

Pirs û mesele naskirî ye. Roja 21 adarê gelên arî di şerê li hemberî De-



haq de bi ser ketiye. Ew xiniztirînê şahînsahiyên dîrokê naskirî ye, yê ku hemû gelên herêmê di gola xwînê de hiştiye û gevizandiyê û hem jî gel ji damar û ji kok de hilgirtiyê û qir kiriye, şewitandin, talankirin, şelandin û dizikirin, şewaza jiyana wî bûye.

Tu derfet nîn bû, ku gelên bindest di bin siha serdestkirina wan dagirkeran bi pêş ve biçin. Ji ber ku mirîna xwe di nav wan de didit.

Hemû gelên di herêma Mezopotamîyayê de dijîn, êl û eşîretên kurdî di wê demê de xwe li hemberî êrîşkirin û serdestkirina împaratora aşûran, rastî du rîyan hatin; Yek pejiwandina koletî û mirinê, ya din jî berxwedana li hemberî mêtîngeran bû. Gelê Medyayê jî, rîya şerê mayin û jiyana, rîya berxwedan û serhildanê ji xwe re girt û kir bingeha jiyana. Ew jî di bîr û baweriyên zerdestî de tê dîtîn; kar û xebatê berxwedan û serhildanê li hember dijminan û girêdana bi zevî û erdê ve, bêhtirî pîncsed 500 sal in ku didome.

Tîstê ku mediyana bi kar û xebatê pê rabûne; çareserkirina dubendiyên hundirîn, ferzkirina jihevderxistina dost û dijminan, destnîşankirina dijminê esasî û yên ne esasî û çêkirina yekîtiya bi berfireh di navbera êl û hozên kurdî de, li rexekê jî vekirin û çêkirina eniyan li gel neteweyên arî yên din, wekî îlam û keldan.

Di vê rojê de, roja adara sala 612 b.z artêşa medya ya yekbûyî di bin rêberiya Key Eksar ango Kawayê Hesinkar de êrîşên xwe yên giran bir ser paytexta aşûran Nînowayê cara pêşîn û paşîn

bû.... ku efsaneya xiniztirîn a împaratoran ji bin ve hilweşand. Leşkerên Medyayê bi hêrs û kîna hezar salan, kevîr li ser kevîran nehiştin û agirê Newrozê dadan, ew agir bû semboleke serxwebûn û azadiyê, ev roj jî bi Newroz binavkirin, ew jî tê wateya roja nuh.

Ji wê demê de gelê kurd jî ket qonaxa bajarvaniyê, ket ronahiya dîrokê û wekî miletekî li ser ax û xaka Kurdistanê hebûna xwe da îspatkirin û biyaşkirin.

Roja 21 adarê, roja serkeftin û serfiraziyê, ne jixweber derkete meydanê û xwe li pêşiya gelê kurd eyankiribû bibe roja cejnê, roja serxwebûnê. Ev roja jî bi gotinên giranbîha li ba hemû gelên arî tê zimên, li ba hinan bûye cejna biharê û li ba hinan cejna dayikê û li ba hin gelên din jî cejna mehrecanê ye...

Newroz û rastiya tevgera azadiyê

Di vê roja han de xatirê xwe ji demsala zivistana dixwazin û li benda xweşbûn û bedewbûna demsala biharê bi hêvî dimîne, şev û roj mîna hev dibin. Roja derketin û belavkirina Zeredestiyê wekî bîrdozekê bû ji bo medan. 21'ê adarê, derketineke nuh nîşan dide, zayîneke nuh dide berçavan, ev bi xwe jî encama gelek salan û serencama vê zayînê jî roja 27 mijdarê sala 1978 dawiya vê pirsê bû. Ji ber ku ew mêjû destpêkirina bîrdoza serxwebûnê û azadiyê bû.

Ji bo naskirin û fêmkirina rastiya Kurdistanê divê ku em rastiya PKK'ê nas bikin û ji bo naskirina rastiya PKK tê xwestin ku em rastiya dîroka Kurdis-

tanê nas bikin û fêr bibin.

Tevgera Partiya Karkerên Kurdistanê bi xwe çêkirin û afirandina insan û civaka Kurdistanê ji nuh ve û gihandina li ber dergehên serdemê ye. Ji ber ku gelê Kurdistanê ber bi rewşeke dawî diçû û jiyana dibû amadekarê ji bo mirin, qirkirin û tunekirinê. Seriyê xwe jî li ser textê serbirin û mirinê danî bû, şûr jî di cara paşîn û dawî de di ser re diçû û dihat. Gelê kurd xwestiyê hin gavan ber bi jiyana ve bavêje, wê meşa ber bi mirinê berepaşî bizivîrine.

Di vê gava girîng de ji binê zîndana 12 rezberê ya reş û tarî de gazî û qerînek derkete meydanê, li rûyê mêtînger û dagirkerên vê demê teqiya, cîhan û alem tev de lerizandin û hêjandin.

Belê... di mirinê de jiyana peyda dibê... di jiyana de jî berxwedan peyda dibê...


Di 15 tebaxê de têkoşîna şerê çekdarî derket holê, bi rêberiya lehengê lehengan, qehremanê mezin hevrê Egîd bû, di demeke ku nedihat bîra kesî de, di demeke ku dijmin di xefletê de bû, wekî ku miriyek ji gora xwe derkeve, kefenê xwe diçirîne, pêngava 15'ê gelawêjê pêk hat. Vê dimenê tirs û saw xist dilê dijmin.

Dîrok diselmîne ku tu raman û fikir, nikare bi ser bikeve û serfiraziyê çêbike û heta ku nebe bîr û baweriyaya têkoşin û berxwedanê. Ji ber vê yekê ji me re jî tu rê nîn e, ji bilî berxwedana ku pal di-de stratejiyêke gelê me, di rîya têkoşîna gelê me ya ji bo parastina hebûna xwe ya neteweyî de.

□ 28 adar 1986:

Mahsum Korkmaz li Çiyayê Gabarê şehid ket.


Serleşkerê Hêzên Rizgariya Kurdistan HRK'ê Mahsum Korkmaz (Egîd) ji Farqîna Amedê ye. Malbata wî ji zû de li Batmanê (Elîh) bi cih bûye. Bi saya Mazlum Doğan tevî têkoşîna Kurdistanê bûye. Di amadekirina çalakiya 15'ê gelawêjê de kedeke wî ya mezin heye. Piştî raperîna 15'ê Gelawêjê ji bo endametiya Komîteya Navendî ya PKK'ê hate hilbijartin. Di 28'ê adara 1986'an de li Çiyayê Gabarê dikeve nav refên pakrewanan.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 23 adar 1960:

Seidê Kurdî wefat kir

Seidê Kurdî, di sala 1876'an de li Hîzana Bedlîsê li gundê Norsê hate dinê. Seidê Kurdî, di 84 saliya xwe de ango di 23'ê adara 1960'î de li Riha yê çû ser dilovaniya xwe. Seidê Kurdî li pey xwe 130 rîsaleyên nûr û bi sedhezaran şagirt hiştin. Hêzên dagirker ji ber ku ji bandora bîrdoza wî diirsayan, piştî ku ew çû ser dilovaniya xwe, cendekê wî revandin. Biriq li cihekî nediyar, veşartin. Ji ber vê yekê hîn ji cihê goristana Seidê Kurdî nayê zanîn.

Fîlmê karesata HELEBJE:**“AVÎNAR”**

Di sala 1988'an de, bombeyên kimyewî bi ser kurdan de dihatin barandin. Kurdên ku haya wan ji tiştêkî nîn bû, rojekê ji xewna xwe hişyar bûn û beramberî çekên kimyewî ku bi gaza hardalê hatibûn tijîkirin man. Bi vê êrişê pênc hezar gund bi bédengiya mirinê hatin rapêçan. Nêzikî pênc hezar mirov tevî jin, mêr û zar û zêçên xwe jiyana xwe ji dest da. Ji 40 hezarî bêhtir mirov dibin karîgeriya çekên kimyewî de man. Hin kor bûn, lal bûn û hin jî seqet man. Niha jî ew tesîra gaza hardalê xwe li ser zarokên nûhatî, nîşan dide.


Gelek dewletan ev karesat ji ser guhê xwe re avêt. Ev li aliyekî tu kesî berê xwe neda Halepçeyê û li rewşa kurdan nepirsî. Lewre jî li ser Halepçeyê tiştêkî aliyê raya giştî ya cihanê ve ne hate nivîsîn û ne jî ew wekî filmekî hatiye kişandin û mirovahî bi wê komkujiyê nehesisaye. Bi tenê televîzyoneke îranî wê demê hin dîmen ji komkujiyê wergirtine. Wekî din tu dîmenên tevkujiya Helebçeyê di destê tu kesekî de tunene.

Mixabin bi tenê filmekî bi farisî bi navê “Avînar” li ser komkujiya Helebçeyê hatiye amadekirin. Derhênerê vî filmî Shahram Asabî, ku bi xwe kurd e, bi xwere nedîtiye ku dîmenên rastî yên di dema ku balafir gazên kimyewî bi ser kurdan de dibarînin, bi kar bîne. Bi awayekî hêsân, bi riya montajê xwestiye ku dîmenên şer bide nîşan. Lê bi ser neketiye, ji bilî bi ser neketinê mantiq jî girîng e. Çima dîmenên rastî wekî belgeyekê ranaxe ber çavan? Ji aliyê din ve film bi hin tiştan hatiye sînorkirin. Wekî nimûne, peyva kurd an jî Kurdistan derbas nabe. Hin şibandinên pêkenî û seyr jî di film de hatine bikaranîn. Derhêner, di şer de bazirganî baş derxistiye holê. Lê li aliyê din valahiyek danegirtiye û helwesta dewletên cîranên kurdan û siyaseta wan a wê serdemê raber nekiriye. Dîsa komkujiya Saddam a li Helebçeyê, zêde diyar nabe. Gelo film li ku hatiye kişandin? Ev komkujî li kîderê pêk hatiye? Der barê van pirsên ku di serê temaşekar de çêdibin, tu agahiyên tertîjî nehatine dayîn.

Film di warê pêşkeşkirina hêmanên girîng ên jiyana û mirinê de bi ser ketiye. Wekî mînak: Dema gundên Helebçeyîyan serobino dibin, koçberî dest pê dike. Di nav wê koma koçberan de qasî çend rolên ji hev cuda (wekî karakterê kurdan hatine nîşandayîn) digihêjin hev. Yek ji wan bazirgan e, yek karmend e (qasobûrokrat) û yek jî zêrfiroş e. Ji bilî van çend heb jî gundî ne. Çavê van kesan ji ber gaza hardalê kor bûye, ji ber vê ber xwe nabînin. Bi tenê di navbe-

ra wan de çavê bazirgan xwediyê qantirê dibîne. Ew kesê zêrfiroş beramberî 3 hezar dînarî li qantirê bazirgan siwar dibe, ji bo ew bazirgan wî derxe derveyî sînorê Iraqê. Bazirgan jî riyana baş dizane. Ew li serê çiyayekî bilind dimeşin. Lingê qantirê dişemite û zêrfiroş û qantirê dikevin xwarê û dimirin. Bazirgan, bi ber qantirê zêran dikeve, lê, bi ber zêrfiroş nakeve. Bazirgan, bi kesên mayî re ji bo ku ew kes dakevin xwarê zêran hilbînin, bazarê dike û dibêje: “Eger hûn pênc hezar dînarî nedin min, ez we bi xwe re nabim” Dawiya dawî ji bo ku zêran ji xwarê hilbînin, ji nav ên mayî benikekî li piştê Şivan girêdidin û wî bi ben dadixin xwarê. Di wê navberê de benik ji destê gundiyan difilite û Şivan gavekê ber bi mirinê ve diavêje. Di heman demê de, pozê Şivan li guleke neçilmisî rast tê û ew wê gulê bêhn dike. Bi rastî jî ev dîmen zor seyr bû. Di wê demê de ligel nebûna derfetên teknîkî û yên din film, baş hatiye sazîkirin. Dîsa tiştêkî balkêş ku di film de xwe di-de der, rev ji bo jiyaneke azad û bi rûmet ne çare ye. Ji wê koma koçber bi tenê du kes difilitin. Di film de, kêr hindik dema ku mirov rewşa kurdan a îroyîn binirxîne, hin taybetmendiyên kurdan baş hatine pêşberkirin. Lê ji ber ku dublaj bi tirkî hatibû kirin, temaşekar di warê lêhûrbûnê de dikeve tengasiye. Bi kurtasî li ser kurdan film çekirin, ji bo belavbûna rastiya kurdan li cihanê gelekî girîng e. Em yî filmî jî ligel hemû kêmasiyên wî bi vî rengî dinirxînin. Film jî aliyê beşa sînemê ya NÇM'ê ve roja 13.3.1998'an li NÇM'ê hate weşandin

AZAD ALTUN

ÇAVDÊRÎ**Em dê bibin yek û bi ser jî bikevin**

SERKAN BRÛSK

Van rojên ku, em bi lez û bez li Newrozê nêzik dibin, li welêt û derveyî welêt gelek bûyer diqewimin. Ev bûyer dualî tesîrê li me dikin. Mirov dikare hinek ji van bûyeran wiha rêz bike: Berdewamiya şerê rizgarixwaz ya Kurdistanê û dirindeyî û hovitiya dijminên me; şerê navxweyî li Kurdistanê û hewlên bo çareserîkirinê; amadehiyên ji bo Kongreya Neteweyî ku tê wateya di radeya herî bilind de yekîtiya me kurdan. Dawî ji mirov dikare êşa koçberên Nînova (pêşî Etrûş bû) di nav xalên herî girîng ên van rojên de bihejmêre.

Bêguman êşa koçberên Nînova dilê hemû kurdên dilsoz dişewitîne. Ev hemwelatîyên me, ku ji ber zîlma dijmin koçberî başûrê welêt bûne, wekî ku em dibînin dijmin li wir jî dev ji wan bernade û dixwaze jiyane ji bo wan bike dojeh. Mirov dikare vê fêhm bike. Dijmin e. Minet tê de tune ye. Lê ma helwesta PDK'ê em dê çawa binirxînin? Gelo ev hewldanên ku beramberî koçberên bakurê Kurdistanê tên kirin, çi qasî bi heq in û dê tesîra wan li ser nîşên pêşerojê çawa çêbibe? Bi raya min, rayedarên vê partiyê, divê kumê xwe deynin ber xwe û li ser kirinên xwe baş bifikirin. Ji bilî koçberiya hundirîn, ya derveyî jî heye. Bi keştiyan hemwelatîyên me dikşînin Ewropayê. Li van deverên xerîb û nenas her roj hejmara me zêde dibe. Ciwanên me il xeribiyê bêkar û bêperwerde dimînin.

Lê dîsa jî, em koçberên van deran ji nîrxên xwe yên neteweyî dîr nakevin û li dijî dijminên xwe dibin hêz, bi saya sazî û dezgehên neteweyî ku ji aliyê şoreşê ve hatine avakirin. Em divê xurtiya şoreşa xwe ya di vî warî de teqdir bikin û bi hemû hêza xwe ji van saziyên xwe re ku dê bingeha dewletbûna me pêk bînin, bibin qewet. Em divê saziyên xwe yên li derveyî welêt û hundirê welêt baş biparêzin. Ji ber ku dê Kongreya Neteweyî jî li ser van ava bibe. Jixwe ji niha de hewldanên xurt ji bo Kongreya Neteweyî hene. Li kêleka van hewldanan helbet dijminên me jî desvala rûnanin. Lê em kurd, divê dev ji mesela Kongeraya Neteweyî bemedin.

Çima em divê dev jê bemedin? Ji ber ku kongre li ser asta herî jorîn, li hevhatine me kurdan e. Bersiva daxwaza Ehmêdê Xanî ye. A dilê me û bi dilê me hemû kurdan e. Ez bi xwe tu kurdekî nê nabînim ku bibêje: “Wileh Kongreya Neteweyî ne bi dilê min û min navê.” Ji bo mirov vê yekê bibîne, pêwîst nake mirov siyasîmedar be. Êdî gelê Kurdistanê dixwaze hêza xwe kom bike. Yekîtiya xwe ava bike û bi vî rengî derkeve pêşberî cihanê. Tevî ku ew tişt ew qasî bi dilê kurdan e, baş e, çima pêk nayê? Ger hûn ji min bipirsîn, ji tesîrên hundirîn bêhtir yên derveyî li pêşiya vê daxwazê dibin bend. Çima? Ji ber Kongreya Neteweyî dê heta radeyekê van pirsîrêkên ku me li jor behs kir, çareser bike.

Dîsa bi saya vê avahiyê destên dijminan yên di nav me de dê ji binî ve qut bibe. Û bi vê qutkirinê re tradîsyona (kevneşopîya) xayintiyê jî dê ji nav me rabe. Bi rakirina xayintiya nav xwe, em dê ji bo biryargirtina li ser qedera welatê xwe bibin xwedî gotin. Ev yek jî dê meselaya me kurdan bi awayekî mayînde bixe rojê cihanê.

Li bakurê Kurdistanê bi gelemperî yekîtiya xelkê çêbûye. Mirov dikare rola vê yekîtiyê bi pêşketina şoreşê bipîve. Ger mirov ne dilrêş be, pir bi rehetî dikare çavdêriya pêşketinê şoreşa Bakur bike. Jixwe ya ku hêviya me xurtir û çendqatîr jî dike ev e. Her diçe hejmara kesên me ku bi van pêşketinan dihesin, dibînin, nas dikin û beşdar dibin zêde dibe. Baweriya me tevî hemû kêmasî, kêr û kurîyên me bi me heye û çavên me ji me dibînin. Ji ber ku em bindestiyê layiq û minasibî xwe nabînin, em dê bibin û bi ser kevin.

Jiyaneke dilsoj û Mele Nuriyê Hesarî

Mala Mele Nûrî, di nav wan malên ji herî û kelpîçan de winda dibe. Li oda mêvanan leganek hatibû danîn ji bo dilopan. Û pelê rojnameyekê jî di leganê de bû, da ku dilop bêdeng bêne xwarê. Vêca min jî ji xwe re digot:

"Ewqas sal vî mirovî êşa helbest û zimanê kurdî bi xwe re hilgirtiye û bi pirtûk û xwendinê mijûl dibe, ma gelo tu encam ji vê çêtir tunebû ku di ber dengê dilopan re, li ser ziman û toreya kurdî dixebite?"

HELÎM YÛSIV

Li Qamişlo, roja duşemê (27/10/1997), berêvarê, me berê xwe da mala wî. Baran ji erd û ezmên dihat. Herî û serma û şiliyê di wê rojê de Qamişlo bêdeng kiribû. Û ji ber ku Mele Nuriyê Hesarî hatibû hilbijartin, wekî xelatgirê Mîhrîcana Pêncan a Helbesta Kurdî, Komîta xelatê, çend kesên din ku bi teyayî ev bûn (Deham Ebdilfettah, Konê Reş, Rezo; Ferhadê Çelebî, Ebbas Îsmaîl, Samiyê Melayê Namî, Ebûcîm û Ebû Reşo) Ligel hev me berê xwe dabû gundê Cimayê. Û di navbera Cimayê û taxa Qentissiwê de mala Mele Nûrî, di nav wan malên ji herî û kelpîçan de

winda dibe. Bi pirsê û di nav ava girikî re me berê xwe de deriyê wî. Li odeya mêvanan leganek hatibû danîn ji bo dilopan. Û pelê rojnameyekê jî di leganê de bû, da ku dilop bêdeng bêne xwarê. Vêca min jî ji xwe re digot: Ewqas sal vî mirovî êşa helbest û zimanê kurdî bi xwe re hilgirtiye û bi pirtûk û xwendinê mijûl dibe, ma gelo tu encam ji vê çêtir tunebû ku di ber dengê dilopan re, li ser ziman û toreya kurdî dixebite? Gava di rê de ji hevalan yekî got: "Berê me li helbestvanekî gewre ye." Di he-man kêfê de helbestvanên gelên din xwe davêtin xeyal min, ku bi halxweşî û kêf û dorpeçkirina jinên spehî û bêyî tirsê ji pêşerojê ew dijîn. Gelo qeder ji ya kurdan reştir heye? Ku berî herkesî afirîner, torevan û hunermend, zehmetî û êşê dikişînin û ji her kesî bêhtir bexwedî û bextreş in. Seydayê Mele Nûrî jî vê yekê tîne zimên:

*Çiko bextê me hê kor e
diçim tiliyan bi qehir û gez*

Gava Seyda kete hundir, bi rûyekî geş û bi kêf silav li me kir. Lê bi destê çepê û bi dengê westiyayî û nerm xêrhatin di me da. Çimkî ji sala 1991'ê de, ku Reşayî û zora derdorê ne bes bû, bayê pûçbûnê jî nivê gewdeyê Seyda dabû ber xwe. Lê bi alîkariya Dr. Hiznî Haco- berî ku derkeve Ewrûpa, û li nexweşxaneyê Nafiz (ya ku li ser navê welatparêzê navdar Dr. Ahmed Nafiz bû) hinekî rewşa Seyda pak bûbû û dema dixwest bersiva pirsên me bide, zimanê wî gelekî nedigeriya û bi tilî û çavan li ber xwe dida, da ku bersiva xwe bide. Her ku pirsê destnivîseke wî dibû, deng ji Seyda nedihat, lê hêz dida xwe û diçû destni-

vîs ji odeyê din dianî. Seyda di destnivîseke xwe de wiha dinivîsîne:

*Xwezî cergê mi xweşbûna
kul û derdê mi rabûna
di gasîna ziman hingî
hinêb wê xweş xuyabûna*

Seydayê Mele Nûrî bi vî halî, radihêje pirtûkên xwe û li xwendevanên zimanê kurdî, li kolanên Qamişlo û derdorê yeko yeko digere.

Ji berhemên wî yên çapkirî:

1-Şoreşa Barzanî-Helbest, 1995, Qamişlo

2-Axlîma (pêlên helbesta kurdî) 1996 Şam

3-Hozanbêj-weşanxaneyê pencînar-1996, Swêd.

Ev gotar jî, berî helbest û nivîsên wî li ser wî ye -wekî mirov- gelo Mele Nuriyê Hesarî kî ye?

Di sala 1934'an de li Hesarê, li bakurê Kurdistanê hatiye dinyayê. Çarde salî daketiye bixetê û zêdeyî çardeh salan meletî kiriye.

Seyda meletî li cem mala Xeznewî çardeh sal û neh meh û bîst rojan xwendiyê. Lê ji roja pêşî de taybetiya Mele Nûrî, welatparêziya wî, neteweperweriya wî, gelekî serêş jê re çêkir. Û di nav karê meletî û oldariyê de karekî neteweyî û welatparêzî jî dimeşand. Bêyî ku mala şêx bi vê yekê zanibin, lê dema encamên kar û xebata Mele Nûrî derdiketin holê, wî xwe nedida paş û bi mîrxasî li helwestên xwe yên kurdîyê û welatparêziyê xwedî derdiket û di salên piştî pênciyê de bûbû birêveberê karê kurdîyê di nav komên meleyan de. Seydayê Mele Nûrî, yek ji wan stêrkên nişê Cegerxwîn û hevalbendên wî yên ku wê demê şopa xwe, bi mêranî, di dîroka civak û toreya gelê xwe de hiştin. Ji wan, Mele Ehemedê Palo- Melayê Namî, Mele Hese-



nê Kurd, Mele Tahîr û Evdê Têlo hwd. vî nişî xebateke zor û dijwar di nav civateke li paşmayî de dimeşand. Di nav tariya kevneperestî û paşketin û nezaniyê reş û dijwar de, bi kar û berhemên xwe diçirîsî û şewq dida. Gelek carî jî Seydayê Mele Nûrî bi navê Pir-êşan berhemên xwe diweşandin. Ji ber ku yek ji van navên bi ronahiyê niha di vî rewşa xerab de û di bin barê ferqîriyê ke kor û bêdengiyê lal de diji û di nav destnivîsên xwe yên ne çapkirî de û li ber dengê dilopan jiyana xwe didomîne. Destnivîsên wî li dora 7-10 destnivîsan e û li ser Ferheng, Helbest, Rêziman û zimanê kurdî ne. Ji bilî destnivîsên ku hatine windakirin, de -

Mele Nuriyê
Hesarî dema
ku ji destê
Ebdilfettah
xelata mîlî



Hêjayî xwendinê!

Seydayê Mele Nûrî, yek ji wan stêrkên nîfşê Cegerxwîn û hevalbendên wî ku wê demê şopa xwe, bi mêranî, di dîroka civak û toreya gelê xwe de hiştine. Erê, Seydayê delal va ye, bi dengê bilind ez pesnê te didim. Û piştî temenekî dirêj, piştî çûna te, ez soz didim ku tenê, bi rêzgirtineke mezin, ez ê bêdeng bimînim. Ji ber ku wê çaxê pesindan wê bibe karê her kesî. U... xwezî hezkirinê hinekî karibûya rewş biguherta û xwestir bikira. Lê mixabin hezkirin tenê xwediyê xwe dişewitîne.

Mele Nûriyê Hesarî, bi salan ji bo gelê kurd hem di warê siyasî û hem jî di warê çand û hunerî de xebat kiriye.



ma veşartin û guheztina malan. Wekî her yekî ji wî nîfşî ku, di rojên zor û girtin û rev û koledariyê de bi dehan destnivîs bînerd û wînda kirine. Û dema Mamoste Deham E.Fetah xelata mîhrîcanê (seateke dîwar bû) pêşkêş wî kir. Seyda bi rûyê xwe yê bi ronî û bikêf û bi nefsbîçûkiyê balkêş digot: "Pîroz be... Lê ez ne hêjayî tu xelatan im." Ez di wê baweriyê de me ku, xelata wî mirovî ew e ku bi alîkariyê ji vê rewşa xerab û ji bin barê feqîrî û bêkesiyê derkeve. Lê ... ka em berê xwe bidin kê ji bilî qederê?!.. Gelo kesek heye li mirovê wilo hêja xwedî derkeve? Yan em ê li bendî koçkirina wî

bin- Xwedê temenekî dirêj bide wî - da e m

, wekî her tim piştî mirinê, li wî xwedî derkevin. Hêjayî gotinê ye jî ku ev gava Komîteya wî Mîhrîcanê cihê spasiyê ye, ku bala me kişand ber bi wî mirovê delal de, di dema tunebûna mirovayetiye de. Gotinên li ser xelatê hatibû nivîsandin ev bûn:

Mele Nûriyê Hesarî wekî ku helbestvan, gelek kar û xebat di ber çand û toreyaya kurdî de kirine. Temenê xwe yê dirêj di warê ziman û helbesta kurdî de borandiye. Di ber van bizavên giranbiha de, Komîteya Mîhrîcanê Helbesta Kurdî ya ku li bajarê Qamişlo li darketiye, xelata wê mîhrîcana pêncemîn pêşkêşî Seydayê hêja Mele Nûriyê Hesarî, Pir-êşan kiriye.

24/10/1197

Komîteya Amadekirin û Birêveberina Mîhrîcana Helbesta Kurdî.

Seydayê Mele Nûriyê Hesarî, yek ji wan mirovên mezin e ku, di serdemeke mirovkuj de jiyana xwe ya pîroz û têrxbat diqedîne. Bi rastî ew hêjayî pesindanê ye. Erê, Seydayê delal va ye, bi dengê bilind- di jiyana te de - ez pesnê te didim. Û piştî temenekî dirêj, piştî çûna te, ez soz didim ku tenê, bi rêzgirtineke mezin, ez ê bêdeng bimînim. Ji ber ku wê çaxê pesindan wê bibe karê her kesî. U... xwezî hezkirinê hinekî karibûya rewş biguherta û xwestir bikira. Lê mixabin hezkirin tenê xwediyê xwe dişewitîne.

Ka em guhê xwe bidin Seyda bi xwe bê çawa jînenîgeriya xwe li ser bergê dawî ji dîwana xwe dirêse:

Evîna welat gelkî tu zor î

Bavê min jê re dibêjin Yûsîf
Diya min bi min gelkî biha ye
Ez li Hesarê çêbûm ji dêrê
Şehra me Mêrdîn li Kurdistanê
Jîna min çardeh gihame Sûrî
Li min bû peyde evîna welat-
Min melatî kir peyde li gunda
Geriyên li gunda nebûme dilxweş
Hatim Qamişlo destê mi vala
Ji ber neçarî ez ketme xana

Ez nadim bi çerxê jorî
Navêk şêrîn e wek dims û hinguv
Navê wê xanîm qîza mela ye
Diya min zû çû (fermo) ji xwedê re
Tirk li wan dîkin îro fermane
Çi hat serê min ji derdê dûrî
Zimanê min bû Xabûr û Ferat
Bûme biyanî di rengê kunda
Qirdê mi kor bû bextê mi bû reş
Guh neda ser min kesî ji hevala
Hişê min tev çû ji derd û jana



Şanonûser û helbestvan Letîf Omer

Mirov le nêwan huner û edeb

Xwêneranî berêz çawpêkewtinî em çareman, le giftogoyêkî dūr û dirêj.... Le gel nûserêkî le nawbangî kurd e... ke şarezayêkî tewaw, lêhatuyêkî çakî tiya derkewtuwe...Ewîş şair û hunermend hêja Letîf Omer e. Ke dêr zêmane be aşkira û na aşkira le berhemekanî xoy şîfî geyandute destî camewer...Çi berhemî şîfîrî bê yan hunerî. Ca bo ewey ziyatir lem hunermend û şaire bigeyn çend pirsîyarêk le xoy ekeyn boy ziyatir jiyânî xoy û berhemekanî xoy ron bikatewe...

Hêja Letîf berhemekanî her be heman nawewe nasraw in? We seretay temenyan bo key egerênewe?

◆ Nexêr... min be hoy çend barêkî taybetiyewe le seretawe be nawî Tîşko berhemim nusîwe yan bilawim kirdîte- we... paşan yekaw, yek be nawî tewawî xomewe.... we min nasrawim be nawî Letîf Omer we xoş im her wam pê xoş e le ber ewe nawî tewawî xom e.... mêjuyî dest pêkirdinî nûsinî min egerête we bo salî 1969-1970 her lew seretayewe gelêk berhemî edebî, le buwarî şîfîrî we le buwarî hunerî wek şano û operêt be encam geyandute.

Etwanî bîzanî berhemekan?

◆ Belê...le rastiya bo yekem car le salî 1970 sîrekîm be nawî, Gule Genim bilaw kirdewe dijî rijêmî ew serdemey Iraq, ke ta êsta heman rijême ser wextî (Amed Hasan Bekir û Sedam Huseyn) bû. Paşan



Kurdistan le rojanî Şorîş (Dîmenêk le şanoî Letîf Omer-1974)

çend cirêkêkî şanoîm pêşkêş kird le salî 1975-1976-1977, le hôlekanî amedeî Silêmanî û holî çalakî qutabxanekan û holî yekîti mamostayan... lêre- da derekewe ke min xelkî Silemanîm û lewe le dayîk buwim... le salî 1983 du kurase- m be nihênîyewe bilaw kirawe, ke xom be nihênî emgeyande destî edîb û edîbdostanî ew kate herdu kuraseş huner- mend Omer Resul, bergekanî nexşandu- we kurasey yekem be nawî Şewêkî Silê- manî duhem be nawî Damawekan...

Le salî 1988 karesatî Helebçe ber- hemêk be nawî "Kanî Xwên" û "Aşî- qanî Şar" le hegbej janma bû. We ge- lê berhemê tîrî huner û edebî le hende- ran le duway salanî 1988 bilaw kirdu- tewe.

Hêja Letîf to basî henderanî kird... aya etwanî bîzanî le salî çenda awa- re buy?. We berhemî awereyît kama- nen?

◆ Le rastî min le kutayî salî 1985 we le şarî xom, le wulatî mergesatewe derbeder û awereyîm qonaxî diramay îran û Surya û Yunan î birîwe ta lem henderanî Holende le salî 1988, le sê- berêkî tarîka bîstewe.... Wek le serewe wutim gelê berhem lem henderan û mergesate be xurbet geyandute... wek çapî "Gule Genim", "Damawek- an" Leberzewe rew ebînim-Rehê- le....

Ke emane hemuy berhemî şîfîrî u îtir le romanşîrî.. ta tewaw kurt ebine- we cigê le wey le gelê şar û şaruçekanî henderan... tewanîme wek nimçe festîval pêşkêşkirdinî le şewey cil û bergî kurdî, poster û filêmî kurdî û silayt û gelê berhe- mî tîrî kulturî pêşkêş be xelkî awere û xelkî bêgane bikem, we le gelê şarî ewro- pa korim saz kirdewe we berhemî xom le zor rojnamekanî biyanî da bilawim kirdu- tewe.

To çon temaşay şîfîrî tazey kurdî ekeyt?

◆ Şîfîr nek tenya lay kurd, belku le he- m e



newey beramber be jiyânî kare ranyarî u komelayetî ke neybînî... le roy teknîke- we... şîfîr zor şewazêkî ciyawaz le klasik.. dataşin û dahenanî helgeranerî, manay şî- rî û hesa kebey wuşey duqer u naşîk û ba- rawî kurdî zor be tazey le şîfîrî êstay kur- diya ebînim.. belam hemu katê min êlem: Hêzî şîfîr, teknîkî şîfîr le lay bawer û cû- rî kartêkirdinî şaire.

Lem duwaye- da gelê edîb û hunermend le Kurdistan giyanî xoyan le dest da to rayit çi- ye? Eger ewanî hoyekanî ronkeytewe?

◆ Emro le Kurdistan pêş ewey ke xe- batî kurdperwerî xoşewîstî kurd û parastî- nî xakî Kurdistan hebêt. Şerî kurda qiran, yan ba bilêm şepolî pir xwênî kurdkujî heye û kawilkirdinî Kurdistan le are ye... çî lem kêşey gewreyey bêguman xelkî ke- sî lem lafewe dête kuştin hunermendîş ber ekewê her çend ebêt hunermendî rastgo, edîbî be edeb ebêt cêgayan rêz uû stayîş bêt nek be firo bixene naw xwênawî tî- rorkirdin.

Wate ebêt hunermend xawenî desthe- latî xoy û bawerî xoy bêt... ca be lay ew edîb û hunermendenay be bêtawan ekew- ne dest tîrbaranî kurdkuje ewe hemû kate cêgay dax e we ebê ew tabanwaranê sizay tawanî xoyan wergirin.

Aya hiç berhemêkit heye le ser ew şe- rey le nêwan partekanî Kurdistanî da?

◆ Belê... lew rojey şerî kurdkujî destî pê kirdewe.. naxim bê aga nebuwe ewey hêzî şîfîrî arezoy kirdibê wutume û hergî- za û hergîz min ewane tawanbar ekem minîş le zîmanî şîfîrekanmewe hest û hoşî xom der birîwe îtir çî le şewey rexne bêt çî le naz û raz ûsikala bêt yaxot amoje bêt, şîfîrekîm heye be nawî, "Sî Sal e" ke te- waw le ser ew şere ye le zorbej şarekanî handeran û wulat xwêndrawetewe cêgay razemendî be lay hemu ew kesaney ke di- jî em mergesaten.

FERHAN ZÊBARÎ/ HOLLANDA

Sî Sal e

Ke natiwanin...
hengaw binên...
le kenarî wan u dukan
le rubarî awî Sîrwan
dûrkewinewe
şepolekan zor sitemin
be serd şanî
pirolitarya meznênin
ke natwanin nemamêkîtiya biçênin
roy be hêzî
le hewrazî sext menênin
şax le xotan tore meken
tawêrekan german girin
keley sertan
le ber petana eharin
bes e îtir
qijtan beserewe ne hêşt
qaç û dest tan birîwe
le nûw zam û eşa
darêktan ne xiste ser dar
hezar baxtan birîwe
yan le rega heltan kêşa
berdêktan nexiste ser berd
gundêktan nekird awa
le soran û badîna
hezartan kirde kelawe
besî îtir...
cutpê le ser singî wulat laben
em welate neşmîleye...
semakerî, naw camxaney şewî mest
û arezuy be xeyal niye
bes e îtir....
ser bilind ken, wulat bukêkî mare
birawe
le birî mêrdê çuwarî heye
serbarî mêrde ziley werg zebelah
ke çî ewe le damênî pişt sêberî ew
zilane, taze zaway sere girîun
pêşbirkêy şewî buktane
ke natwanin tenha katî xoşyêkî pê
bibexşin, îtir bo çî sing û şan û milî
pê rot eken.

Diltan

Xozgem şehîd
yek şehîd buwa ye
yek dest buwa ye
tirpey diltan
tirpey dilî yektir buwa ye
nek bim daye
awa çingtan le naw geruy yektir
buwaye
ya memkî cûwanî daykmân
le mistî em û ew buwaye.

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **22 adar 1998 yekşem:** Gotûbêj: Rêxistina Navneteweyî ya Lêborînê
Mijar: Nasandina Rêxistina Navneteweyî ya Efüyê û Danezana Mafên
Mirovan a Gerdûnî. Saet:14:00

Teatra Jiyana Nû: "Komara Dînan:Şermola" Saet:17:30

● **25 adar 1998 çarşem:** Ji xebatkarên Kovara Jiyana Rewşen:"Şevên
Toreyî" Saet:18:00

● **27 adar 1998 în:** Konsera Koma Çiya Saet:14:00
Komara Dînan:Şermola Saet:17:30

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'ê

● **22 adar 1998 yekşem:** Konferans: "Rêbaza Fikirînê"

Cengîz Gündoğdu Saet:14:00

Gotûbêj: "Ji warê pirtûkan-STALIN"

pêşendana Diayê. Pêşkêşkar: Mukaddes Çelik Saet:16:30

● **24 adar 1998 sêşem:** Film: "Rêveberiya Awarte (Sikiyönetim)"

Der:Costa Gavras Saet:18:30

● **27 adar 1998 în:** Konser: "Ji Zimanê Newayan (Ezgilerin Dilinden)"

Muzaffer Özdemir.

Pêşangeha Ahmet Karabulak:

"Tunebûna te dê bibe raperîn"

"Hestên min yê neteweyî zorê li min dikin, da ku ez êş û janên gelê xwe, di xêzên xwe de bidim jiyandin..!"

Xwediyê van gotinan Wênesaz Ahmet Karabulak, roja 18'ê adarê li NÇM'ya Stenbolê bi navê "Tunebûna te dê bibe raperîn pêşangeha xwe ya yekemîn vekir. Her çiqas ev pêşangeh ji bo Karabulak, pêşangeha yekemîn be jî; ji bo NÇM'ê di Newrozê de vekirina pêşangehan bûye kevneşop û ev pêşangeh a 7'an e.

Ahmet Karabulak, xebatên xwe bi lavî û boya-xên don pêk tîne. Pêşangeh ji 20 tabloyan pêk tê û

wê hefteyekê bidome. Di berhemên Karabulak de, figûrên serhildêrî û xembar balê dikişînin ser xwe. Ji bo wê yekê Karabulak dibêje: "Rast e! Ji wêneyên min xembarî difûre, ev yek di xêzên dîlan û govendê de jî xwe dider. Bêguman sedemên wê yekê, rewşa ne-asayî ya

gelê kurd e." Ew, diyar dike ku ew ê rojekê, wêneyên şên û şahiyê jî çêbibe. Wênesaz, ji bo pirsê me ya bi rengê: "Gelo tu çî navî li ekola xwe dikî?" dibêje ku navê ekola wî 'ekspresyonîzm' e.

Ahmet Karabulak dide zanîn ku, ew di sala 1971'ê de, li Konêreşa Çewlikê ji dayik bûye. Têkiliya wî bi wêne û xêzan re di dibistana seretayî de dest pê kiriye û piştî kutakirina dibistana navîn, wî, li Enqere û Îzmîrê qûrs û dersên wêneyan dîtine û niha jî ew, li Zanîngeha 19 Mayısê perwer-

dehiya akademîk dibîne. Karabulak, bi giştî li ser wêne, NÇM, rewşa giştî dîtinên xwe wisa anîn zimên: "Ez ji qewimînên civakî sûtê werdigirim. Li cografyaya ku em tê de dijîn, tehrîbateke mezin çêdibe. Ez nikarim li hemberî wê yekê sersar bim. Car caran ez motifên herêmi bi kar tînim, lê di tabloyên min de xêzên neteweyî zêdetir derdikevin pêş.

Ji bo çî NÇM? Lewre, em nikarin xebatên NÇM'ê ji têkoşîna rizgariyê cuda bifikirin.

Di destpêkê de, min çewsandin, pest û kotekiyên li ser xwe bi riya xêzan didan der, lê piştî sa-

lên 1990'î pest û kotekiyên li ser gelê kurd cihê xwe di tûalên min de girtin. Salvador Dalî û Picasso wênesazên şareza ne, lê ji ber ku şewazên me ne yek in, wan zêde tesîr li min nekiriye. Ji wênesazên Kurdistanê cara yekem min Fewzî Bilge nas

kir. Bi rastî jî xêzên wî kesera dilê kurdan baş tînin zimên. Ji destpêkê ta îro, li Bakur bi çavekî baş li wênesaziyê nehatiye nêrîn.

Ev her du beşên hunerê bûne wekî zarokên hewiyê. Wênexêzkirin her dem guneh hatiye dîtin. Lê Başûrê welat gavên baş avêtiye. Wekî gotina dawî dixwazim bibêjim ku, di welatekî azad de ez dixwazim di nav foneke çik-sayî de figûreke sor ku dibeze xêz bikim"

SALIHE KEVIRBIRÎ

NEWROZ

Tu tiştî nekarî biguherîne wateya te
Ne girtin
Ne lêdan
Û ne jî kuştin,
Lewma
Dîwarên hepsa Diyarbekirê
Nikaribû bi sinor bike evîna Mazlûm
Nikaribû bişikîna bawerîya çaran
Dîsa, tevkuji jî bikêrî tişteki nehatin
Ne Dêrsim,

Ne Zîlan
Û ne jî Helepeçê...
Dêrsim bû destpêk
Zîlan bû heval
Û Helepeçê da pey wan
Heya serê çiyayê Gabarê
Ligel kulîlkên biharê
Dest bi jiyane kir
Jiyaneke nû
Rojeke nû
Û dîsa bû Newroz

(Bedran Çiyayî)

Heyva adarê kulîlka biharê ye. Destpêka evîna Mazlûm, Xeyrî, Kemal û Egîdan e. Dîsa di dîroka kurdan de rûpeleke bi çalakiyan xemilandî ye. Em li ber şehîdê adarê tevan; Helepeçê, Mazlûm, Egî... rêzê digirin. Cejna Newrozê li gelê xwe û li gelên Rojhilata Navîn ên aşfîxwaz û azadîxwaz pîroz dikin.

XWENDEVANÊN ZANÎNGEHA 100. YIL A WANÊ

TÎŞK

Niwîsa nûştoxê ma
nêkewte destê ma



LERZAN JANDÎL

NEWROZ PÎROZ BE

Gelê kurd û gelên
Mezopotamya yê mazlûm, li
ser esasê federasyona gelan
yekîtiya xwe çêkir, di dîroka
de jî serê nû de xwe bi
Newrozê afirandin. Ji wan
rojan heta van rojan ne şer, ne
jî berxwedan li ser wê cografiyê
rawestiya. Di bîra çiyayan de her
dem agirê berxwedanê hûr hûr gur dibû!



- Newroz, serhildana geş e!
- Newroz, nexşa azadiyê ye!
- Newroz, pê bi pê berî bi azadiyê ye!
- Newroz, bejnên wekî alê pêk fine!
- Newroz, navê me yê bi rûmet, hesreta me ya sedşalan e!

Em Newroza gelê xwe yê leheng û hemû gelên Rojhilata Navîn pîroz dikin, li ber bîranîna şehîdên şoreşê serê xwe ditewînin!

Bila ev Newroz bibe bangêk ji bo yekîtiya neteweyî û hemû gelên Rojhilata Navîn û gelên Tirkiyeyê!

**NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA
ŞAXÊN STENBOL, ÎZMÎR, EDENE,
RIHA, AMED, MERSÎN Û HEWLÊRÊ
NÇM YEKÎTIYA MALBATAN
KESKESOR KARGEHA HUNERÊN BEDEW
KOVARA JIYANA REWŞEN**

Elo lawo



Go hebû mêrikek û tevî jin û keça xwe. Navê bavê keçikê Mîrze Miheme bû. Rojekê xwezgîniyê keçikê tên. Bavê keçikê dibêje:

“Keça min, here ji mêvanan re ji quletenkê avê bîne, ji wan re çayê çêke.” Keçikê diçe nav quletenkê. Lê dinihêre darekê sêvê, ku li ser quletenkê ye û pê ve jî sêvek tenê bi quletenkê ve xwar bûye. Keçik di ber xwe de xeber dide:

“Hahî, hahîî, ez ê mîr bikim, ji min re dê kurek bibe, ez ê navê kurê xwe deynime Elo, Elo biçûk e, zarok e û were xwe bavêje vê sêvê û destê wî negihêje û ji dorê de li nava quletenkê bikeve û bixeniqe” û dest bi girîna dîke. Mîrze Miheme dinihêre ku keça wî nehat. Ji jina xwe re dibêje:

–Jinik, ka here keça te li ku ma? Jinik diçe lê mêze dike ku keça wê digirî. Dibêje:

–Keçê çî bûye ji te? Tu çima digirî? Keçik dibêje:

–Derdê min giran e. Dayê ez ê mîr bikim, wê kurek ji min re çêbe. Navê kurê xwe datînim Elo, Elo zarok e, ew

ê were xwe bavêje dara sêvê, li nav quletenkê bikeve û bixeniqe.” Diya wê jî rûdine pê re digirî. Bav, lê dinihêre jina wî jî nehat. Mîrze Miheme xwezgîniyan li malê dihêle, radibe diçe ser quletenkê. Dipirse:

– Hûn çima belesbeb digirî. Jinik jê re meseleyê dibêje. Mîrze Miheme hêrs dibe, digre darê û li kêleka wan dikeve û dibêje:

– Ez sond dixwim, heta ku ez ji we kertir mirovina nebînim, ez neyem vê malê” û terke dinya dibe, diçe.

Çol û çolistan, ber û beristan, serê Mîrze Meheme taze kete xav û xovendê giran. Çû di welatekî re bi lez derbas bû. Jinek bi pey ket jê pîrsî got:

– Tu wiha bilez ji ku tê jî û diçî ku derê.” Mîrze Miheme bi hêrs got:

– Ez ji cehenemê tîm.” Jinikê got: “Bira, ku tu ji cehenemê tîyî deh roj ewiltir kurê min mir. Kurê min li cehenemê bû an çûbû cenetê.”

Mîrze Mihemed gote wê:

– Kurê te li cehenemê, tazî, birçî û pêxwas bû, xwe dabû qucikekî ji xwe re digirîya.” Jinikê got: “Ji xwedê û pêxember e tu bîstekê bisekine, ez ê xurek û cilan jê re hazir bikim, tu jê re bi-

be.” Mîrze Mihemed got: “Baş e.”

Jinik rabû xurek û cilên mîrê xwe yên herî baş hazir kirin û got:

– Ecele xwe bigihîne kurê min. Ku mîrê jinikê hate mal, gote jina xwe: “Jinik! Kanî cilên min li ku ne.” Jinikê got: “Ez ê tiştêkî ji te re bibêjim, tuyê bixeyidî. Mîrê got: “Na jinik! Çima ez bixeyidim.”

Jinikê got: “Îro camêrek, ji cehenemê hatibû, kurê te jî li wê derê bûye. Li qucikekî cehenemê, birçî, pêxwas û tazî bûye. Min jî rabû hinek cil û xurek dane hev û danê, ku bibe ji kurê me re.” Mîrê dîn û har bû:

– Hey keça bîbavan! Ma mirov ewqasî jî ker dibe, wî tu xapandiye. Jinekê bi kelegirî got:

– Jixwe ez dizanim, dilê te qet bi kurê min ve nebû, te jê hez nedikir. Mîrê rabû hespê xwe zîn kir û bi pey Mîrze Mihemed ket. Mîrze Mihemed dît ku, ji dûr ve siwerek bi lez û bez tê û toz û dûmanê mezî bi pey xwe xistiye. Mîrze Mihemed fêr kir ku, ew bi pey wî ketiye. Rabû eşya û xurekê xwe danî binê deviyekê û hêdî hêdî bi rê de meşiya. Siwar hat gihiştê û got wî:

– Esselamû eleykûm.

Mîrze lê vegevand: “Eleykûm selam, xêr e!”

Mîrê got:

“Birayê delal, te mirovekî bi eşya qet nedît an jî di vir re derbas nebû?”

Mîrze got: “Belê, min dît”. Mîrê got: “Bi kijan aliyî ve diçû?”

Mîrze ew xapand û got:

“Bi kijan aliyî rojava ve diçû. Lê belê tu bi vî awayî xwe nagehîjî wî, ew pir xweş bi rê ve diçû.”

Mîrê lê vegevand: “Çawa ez xwe bigehînimê.” Got:

“Hespê te dibêje, yek, dido, sê, çar, û ê wî jî dibêje yek dido, yek dido. Wekî wisan e tu hespê xwe bidî min, tuyê bi peyatî xwe zûtir bigihîni wî û ez jî hespê te hiltînim tîm.” Hespê xwe da Mîrze Mihemed û got, yek dido, yek dido û bi rê ket. Mîrze Mihemed xurek û cil dan ser piştê hespê xwe, li ser rîya xwe çû. Piştî demeke xwe gihande serê girekî û lê mêze kir ku mirovek li rastê zevî cot dike. Mîrze Mihemed li ser gir dîke qîrîn:

– Ez şaş mame! Ez şaş mame!...

Cotkar serê xwe rakir, li dora xwe nihêrt ku mirovek li serê gir dîke qîreqîr. Cotkar cotê xwe da sekinandin û qesta Mîrze Mehemed kir. Mîrze Mehemed bi lez di piştê gir re fetilî, gayek ji nîr berda û anî piştê girê, dîsa vegeviya li serê gir sekinî û kire qîreqîr:

“Ez şaş mame, ez şaş mame!...” Cotkar hêrs bû got:

“Kureder! Çi bûye ji sibeyê de bûye qîreqîra te, tu nahêlî ez cot bikim.” Mîrze Mihemed got:


“Kureder ji te û ji hingiyekê te re bel! Tu nabîni, tu bi gayekî cot dikî.” Mîrê gote wî: “Na heyran! Ez bi du gayan cot dikim” lê dîsa jî fetilî û li gayên xwe nihêrî ku gayek tenê di bin nîrê de heye. Û hevdu hilanîn çûne ba nîr. Mîrze Mihemed got: “Ez birçî me.” Cotkar çû ku jê re xwarinê bîne. Mîrze Mihemed, gayê din jî ji nîrê berda, patekî rêxê li ser nîrê da, herdu ga dan beriya xwe û bi rê ket. Cotkar, gava ku vegeviya lê nihêrî, ne Mîrze Mehemed ne jî ga li meydanê heye. Çû ba cotê, dît ku patekî rêxê li ser nîrê e. Li ser vê hinekî fikirî û got: “Heyhoy meleyketa ga kişandin birine aşimanan û gava kişandinê patekî rêx li ser nîrê te ketiye.”

Mîrze Mihemed difikire ku, ji keç û jina wî kertir di dinyayê de gelek in, radibe vedigere mala xwe û nav zar û zêçên xwe. Mîrze Mehemed bi eşya, ga û hespê xwe şa bû, hûn jî bi miraz û hezkiriyên xwe şa bibin.

Berhevkar: RÊNAS LALES

War, derket

Şivan Perwer



- Halkların kökenini dil bellirler
RÖM
- Yeni yılın mitselliği ve Kürtler
Fırat, ŞARAFKIRAN
- Zend - Avesta
Yazarı: James DARMESTERER Tercümanı: Mehmet UZUN
- Dengbêjlerin pîri
Mehmet UZUN
- Destana Kawa û Azhi Dehaq
Arjen ARİ
- Nav û Nişanên Kurdên Êzîdî û Şêx Adî
Çavdêr: KURDO Wergêr: Mîrîkî ÇAVPOLAT
- Zilamek û Zimanek
Mehmet UZUN
- Hinek Bîr û Babetên Nû Derhaqê Kalepora Bajarvaniya Kurdî De
Abdurraqîb YUSUF Wergêr: Mîrîkî ÇAVPOLAT
- Jîyan û Berhemên Feqiyê TEYRAN
Prof. Dr. İZEDDİN MİSTEFÂ RESÛL Wergêr: Mîrîkî ÇAVPOLAT
- Serwerê Teyran
Remezan ALAN
- Ferheng - Vajname (Kurmancî - Hewramî - Dimlî - Senendajî)
Abdurrahman UÇAMAN - Nûrî VEYRANCI
- Seydayê Xanî û Mem û Zîn
Abdurrahman UÇAMAN

Hejmara sêyemîn ya Kovara War derket. Di pêşeka vê hejmarê de berpîrsyarên kovarê radigihînin ku, ew dê di hejmara çaran de li ser "Helbesta nûjen a kurdî" dosyayekê amade bikin. Ji ber vê yekê bang li helbestvanên kurdîkin, ku ew digel jînenîgeriya xwe pênc helbestên xwe bo kovarê bişînin.

Di pêşeka kovarê de, çî jî di nava hinek nivîsên kovarê de, di nav nivîsên kurmancî de peyvên dimilkî hatine bikaranîn. Wekî mînak ji dêl ve cejn 'roşan', îro "evro" hatiye bikaranîn. Ev helwesteke di cih de ye. Ji ber ku hem jî bo nêzîkbûna zaravayên kurdî û hem jî ji bo rêlibergirtina bikaranî-


na peyvên çêkirî, pêwîst û bikêr e. Her wiha ji bo vê yekê, divê kovarên ku bi kurdî tî belavkirin, cih bidin hemû zaravayên kurdî. Ev yek bêhtîrîn wê li dijî pêkhatina sînoren derûnî (psikolojîk) bikêr be. Di vê hejmarê de, helbesta Arjen Arî "Destana Kawa û Azhi Dehaq" balê dikşîne ser xwe. Helbest jî du biran pêk tê. Her wiha di helbestê de 62 beş hene û her beş jî 6 rêzan pêk hatiye. Arjen Arî her çiqas bi şewaza serbest helbestên xwe dardirêje jî, wî ev helbest bi awayekî rêzbendî (kafiye) nivîsiye. Seîd Verroj a di nivîsa xwe ya bi sernavê "Terminolojiya keç xwestin û dawetê/dîlan" de digel stranên qala dab û nêrîtên kurdan yên di dawetan de dike. Verroj, qonaxên dawetên kurdan (xwazgîn, qelen, şîranî, cihêz, şeva hinê, piştgirêdan, piştderî, paşperde) vegotîye.

Fikret Sührewerdî jî bi sernavê "Yeni Yıllar Mitselliği ve Kürtler (Mîtanetiya Sersalê û kurd)" nivîsek nivîsiye. Sührewerdî, ligel mînakên ji mitolojiya cîhanê, li ser nişaneyên ku xwe îro jî di pîrozbahiyên sersalê de didin der, radiweste.

Di nivîsa 'Serwerê Teyran' de Remezan Alan tevî nimûncyan çêlî-mitolojiya li ser teyran dike. Divê bê gotin, ji bo kovareke demsalî çewtiyên tîp-rêzî gelek in.

Ji bilî van nivîsan, ev nivîs, hatine belav kirin. Pênasa gelan ziman diyar dike-Torî, Zend-Avesta-James Darmesteter, Pîrê Dengbêjan-Mehmet Uzun, Nav û nişanên kurdên Êzîdî û Şêx Adî, Qanatê Kurdo, zilamek û zimanek Herekol Azîzan (C.Bedirxan) Hinek bîr û babetên nû der heqê kelepora bajarvaniya kurdî de, Abdurreqîb Yusuf, Feqiyê Teyran, Prof. Der. İzzeddin Mistefa Resûl, Seydayê Xanî, A. Uçaman, di nava pêvajoka diroka de navê "Diyarbekir"

SERWISA ÇANDÊ



Şivan Perwer "Xewna min" Dr. Qasimlo

Tevî vê kasetê Şivan Perwer 13 kaset hatine weşandin. Şivan Perwer, dîsa di vê kasetê xwe ya 13'mîn de, li ser guhartinên siyasî ya dinyayê û guhartinên ku pêwîst in li welatê wî bînin kirin, radiweste.

Di kasetê bi nav "Xewna Min" de 8 stran cih digirin. Şivan Perwer, sê stranên xwe ji Selehattin Bêrtî, Sebrî Botanî, Alan Botan û Hêmin Mehabadî wergirtine. Şivan Perwer di vê kasetê xwe de stranekê li ser Dr. Abdurrahman Qasimlo jî dibêje. Bi giştî ev kaset jî stranên ku berê hatine gotin, pêk tê.

Êrîş nikarin rê li ber meşa azadiyê bigirin

CELALETTİN YÖYLER



Roja heştê adarê li seranserê cîhanê, cejna jinan e. Bi wê armancê jinên kurd jî, li metropolên Stenbolê-li her derê; bi hezaran digel zarok û dergûşên li ber pêşîrên xwe derketin kolanan û li Meydana Taksîmê li hev civîyan. Di nava wê civînê de jî cur bi curên çînen pîrekan cihên xwe li ser qada wê meydanê girtibûn û bi cure û cur sirûdên şoreşgerî daxwazên xwe yên ji bo mafên jinan li her deverê û li Kurdistanê anîne ser zimên. Wan dikir qêrîn û digotin, bes e binpêkirina mafên me! Bes e erîşên li ser namûsên me! Bi rastî dimenên ku li ser wê qadê dihatin xuyakirin, pîr balkêş bûn.

Lewre ew civîna mezin û girseya ji gelekî beşên jinên karmend û karkerên kurd ku hatibû pê, ew jî bo pîrozkirina cejnê-hatibûn wê meydanê. Ew jî bo ku

nifirî û hêrsa xwe ya gelekî salan bi serbestî û serfirazî ji raya giştî re bidine xuyakirinê hatibûn wê qadê. Lewre wan baş dizanibûn ku hêj ew jî bin zilm û zordariya kevneperestî û dagirkeriyê nehatine rizgarkirin, hetanî ku ew roj jî wan re mîna cejnê were pîrozkirin. Pîr mixabin encamê ev yek nişan dida. Lewre jî her hêlê ve ew bi hêzên zordaran hatine dorpeçkirinê û bûne armancên êrîşên hovane yên barbariyê.

Belê bi rastî hêj jî jinên kurd nikarin bêjin: Em cejna xwe pîroz dikin. Ji ber ku hêj jî ne azad in. Lê bi rastî jinên kurd êdî dikarin mafên xwe-yên jinanî û mirovahî li her derê û li her qadê bînin ser ziman û biparêzin. Belê rast e jinên kurd her çiqas hetanî niha jî hêla kevneperestîya hinekî mîran ve û hinekî paşverûyên bi navê olê ve hatibin perçiqandin jî, ew êdî bi tîrêja tevgera rizgariya neteweyî re hatine ronahîkirinê û xwe nas dikin.

Bila her kes baş bizanibe ku jinên kurd jî wekî jinên hemdem ên pêşverû wê di her warî û her karî de, li kêleka mîrên kurd bikeve nava têkoşînê jî bo serbilindî û serfirazîya xwe û gelê xwe. Hem jî tu erîşên hovane û dirinde,

nikarin xwe li ber vê tevgera wan a azadîxwaz bigire.. Jinên ku bi helwesta xwe ya li hemberî erîşa hovane, dan nişan ku ew her tim li hemberî bêdadiyê, nijadperestîya dirinde ne. Wan bi nifirî û bi hêrs digel zarokên li ber pêşîrên xwe, derketin kolanan û qîr kirin û gotin em jî dixwazin wekî jinên cîhanê yên serfiraz li her derê bi serbestî û serfirazî bijîn.

Pîr mixabin digel van serhildan û xwepêşandinên gelê kurd, hê jî rejîma xudanê bîr û bawerîya fermî di dixwaze gelê kurdan bi taktîkên xwe yên perwerdehiyê zarokên kurdan bihelîne (asîmîle) bike. Bi zanîna min ew ketine nava gemarî û heriyê. Hem jî ketin nava bê hêvîtiyê û şaşiyên pîr mezin û nizanin ku wê li hemberî tevgera gelê kurd çî bikin. Ew bi xwe jî baş dizanin ku ev taktîkên wan ên bi gemar tu karekî ji wan re nayne û wan jî tengasiyan rizgar nake. Lewre ew bi xwe jî dizanin, ku zarokên kurdan li ser milên dayikên wan her roj li qadên berxwedanan û serhildanan in. Wê çawa werine helandinê û asîmîle bibin? Ew zarokên li Meydana Taksîmê û li her derên metropolan û yên welêt ew êdî bi mebestên Ecevit û hewldanê wî nayêne asîmîlekirin.


Mişk, dims û nêçîrvan

Komek nêçîrvan (seydvan) li çolê pir birçî bûbûn, wan bi zorê xwe gihard gundekî. Li rexê gund, bûn mêvanê malekê. Lê nihêrîn ku, keçikeke biçûk li malê ye. Jê re gotin: "Qîza min weleh em pir birçî bûne, hema tiştêkî ji me re bîne, em bixwin." Keçikê çû, firaqek tijî dims kir û li ber wan danî. Nêçîrvanan nan çandinê û di cih de ew xelas kir. Keçikê got: "Ka ez ji we re dîsa dagirim." Çû dîsa firaq tijî kir û anî. Çar, pênc caran firaq tijî dims kir û li ber danî. Dawiyê nêçîrvanan yekî xwe zeft nekir û got: "Qîza min ma qey dimsê we pir e?" Keçikê got: "Na weleh! Mişk ketiye nav dimsê me, kes naxwe." Nêçîrvanekî yekser rahiştê temsikê û li erdê xist got: "Ev tu çawa dimsê mişk ketiyê, didî me." Temsik parçe û parî bû. Keçikê da girî û got:

- Îî qafikê kuçikê min jî şikand...!

Zêde Xwedê meşxûl neke

Xîço û Piço her du li taxekê diman. Her du jî diçûne mizgeftêkê. Piço dewlemend bû û ji bo ku karê wî rast here dia dikirin. Xîço jî ji bo



karê wî rast here li mizgeftê dia dikir, lê yê wî tiştên biçûk bûn.

Rojekê dîsa wekî ku hîn bûbû Xîço çû li kêleka Piço rûnişt û dest bi nimêjê kirin. Dawiya nimêjê her duyan jî dia dikirin. Piço digot:

-Yarebî tu îcar jî karê min rast bibî. Weleh wê deh milyar bêne destê min, yarebî tu kargeha (işyeri) min bistirîne...

Xîço jî jixwe diayên biçûk dikirin.

-Yarebî diravên solekê ji min re bişîne, weleh ez pêxwas mame...

Piço lê hay bû ku Xîço ji bo solekê dia dike û hema pêncî hezar ji bêrika xwe derxist û got:

- Hişşş, zêde Xwedê meşxûl neke, ji bo vî karê biçûk. Tu lê dinihêrî ez milyaran dixwazim. A ha ji te re pere! Here ji xwe re solekê bikire. Karê min bi Xwedê heye...!

ÇIYA MAZÎ

Ket û mir

Çend karker diçin xebatê. Her ku dest bi xwarina nan dikin, ji hevalekî xwe dipirsin:

- Heval, bavê te çawa rehmet kiribû?

Ew camêr jî, ji nexweşketina bavê xwe ta mirina wî bi awayekî dûve dirêj serpêhatiya xwe vedibêje. Heta ku çiroka xwe diqedîne, nan ji diqede û birçî dimîne. Gelek rojan wiha didome. Ev zilam her tim birçî ji ser nan radibe. Dinihêre, wiha nabe. Ku cardin jê dipirsin:

- Heval, ka tu cardin çiroka bavê xwe bibêje, weleh em ji guhdarkirina wê têr nabin.

Zilam vêcarê dibêje:

- Weleh, hema bavê min ket û mir.

Mala xwedê

Yekî şivan, ku tim li çolê bûye û tu car gund û bajar neditiye, rojekê diçe bajêr. Dema di ber mizgeftêkê re derbas dibe, ji xelkê dipirse:

- Ev mala kê ye?

Dibêjin:

- Ev mala xwedê ye.

Şivan diçe hundirê mizgeftê, li nav digere ku ji bo xwarinê tiştêk tune ye. Vedigere, dibêje:

- Guno, ew xwedê çiqas feqîr e! Min bizanibûya hewqas feqîr e, minê jê re satilek mast bianiya.

ROŞAN LEZGÎN

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (112)

XAÇEPIRSA

X	K	E	O	N
LUXEMBURG				
LUK	DOM			
DAN	A	EDI		
MAK	L	T		
X	V	I	T	E
T	R	I	Ç	A
DER	UN	I		
ŞO	A	Q	A	R
HE	L	I	Z	NA

Bersiva Xaçepirsa 110'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 112'an Kasetê Şivan Perwer e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.




Pênc kesên ku xelata hejmarê 110'an Kovara 'Vate' qezenç kirine: Orhan Yüzel/Mêrdîn, Ferhat Can/Sêrt, Murat Demir/Semsûr, Sorgul Fırat/Izmîr, Seyithan Öz/Stenbol

Ji Şehîdeke Newrozê (wêne)	Daçekek Kelandin	Eli... Paşgîrek	Tevlîhevî Dawera Ziv	Alavekî çîninê Potasyûm	Hêriş, Cerd
Cinavkek Folklorik	Zimanê kolanan Ardû		Dawera Zirkonyûm Pêşya serî	Hejmarek Hêt	Tipeke dengdar Dengdârên 'rade'
Nêzik Tîpa kelt-jandriê	Nûner Avzêl	Daçekek Gelo	Arvan Beşeke mlê mirov		
Dawera hidrojen Amûreke muzikê	Dijwateya erê Cerehat, kêr	Rojek Daçekek			
... û dirb	Çêjek	Tipek Dengdêrên 'tune'	Dawera İyotê Hetaw		
Tecrûbe	Gihanekek				

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8 9



WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Gazete)

Lî ser navê
Glindem Basın ve
Yayıncahê
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibî)
SELAHAATTIN DELI
Yünerim Yeri
Çakırağa Mah.
Sorguçcu Sk. No:
11/6
Tel: (0212) 530 01 40

BÜROYA İRTİBATÊ
(İRTİBAT BÜROSU)
Ayhan İşık Sk.
No:23/3
Beyoğlu /
İSTANBUL
TEL-FAX:
0 212 251 90 13

Germendeyê
Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMI TAN

Berpiratê Kartê
Nivîsaran
(Vazî İşleri Müdürü)
M. SALIH TAŞKESEN

ÇAPXANE
Yeni Asya
Matbaacılık A.Ş.
BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYEN ME
(Temsilcilerimiz)

München:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

Brüksel:
Medeni Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helin Yüsv

Bonn:
Ahmet Barançelîy
49 228 66 17 40

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

Şarî terteleleyê Helebçe lanet kerd

Seraçnaya sera desina wehşeta Helebçe, hetê şarê kurd ra bi lanet û bi sondê heyf-girotena ame şermezarkerdin û lanet varna rîdê kiştöxan. Wehşet, sûka Helebçe de, vakurê Kurdistan de, metropolanê Tirkîya û Ewropa de hetê des hezaran kesen ra ame protestokerdin.

Wesarê sera 1988 bî. Tija wesarî jû kişt ra vewra serê koyan û kiştî bîn ra jî cemedê daran û keran vilêşnayê. Vamêran jî, xo kerdê hedre ke vilikanê xo akere. Şiwanan jî, jû kişt ra naxirê xo çeraynayê, kiştî bîn ra jî amadekarîna pîrozkerdina Newrozî kerdê. Keynan û cenîyan jû het ra pakînan kerdê, hetê bîn ra jî çinayê (kincê) xo yo ke Newroz de xoradê xemilnayê û kerdê hedre.

La belê Saddamê hovî jî biryarê terteleleyê kurdan dabi. Helebçe... bêxêber bî. Ça ra bizanê ke wesarê xo yê peyin de yê. "Heme cayê kuçan cesedan ra pir bi. Boya girane kewtî şaristanî ser. Finê boya hezaran kesen biyarê xo vîrî! Qeçekê naşînî, goştê inanê teze û xîfîk bibi kebab. Zehfê merdan çeçek, cenî, kal û pîrî bî. Keyneyê xamay erd de ravistey mendî bî. Tayn pitî verarê dayanê xo ra pekay bî. Qumatekê verê şitî ke, sînê dayanê xo lewiyeynê, dor û ver de bibî vila. Tayn kesî nanî sero, tayn kesî sarsiya (verasî) hewşê xo de, tayn kesî jî sarsiya dêsan de û çeçekî jî, kaykerdin de kewtî verarê jehrê mergî. Hezaran jiyânî zey şerîte filmî vindarniyaybî....."

Saddamê hovî 16'ê adara 1988 de bi çekanê kîmyewiyana panc hezarî zêdeyirê (vêşî) kurdî bajarê Helebçe de kiştî. Seraçnaya sera desina wehşeta Helebçe, hetê şarê kurd ra ame şermezarkerdin û lanet varna rîdê kiştöxan.

Wehşet, sûka Helebçe de, vakurê Kurdistan de, metropolanê Tirkîya û Ewropa de hetê des hezaran kesen ra ame protestokerdin.

Roja 16'ê adar de sûka Helebçe de, verniyina PKK, YNK, PSDK, PZK, HİK, PDKW û xeylê saziyê kurdan resay pê û Terteleleyê Helebçe protesto kerd. PDK ne tewrê protestokerdin bî û ne jî mesaj eşrawit (rûsnê). Ena helwesta PDK hêrsê şarê kurdî ant xo ser.

Serokê PKDW Yaşar Kayay jî, seba seraçnaya jû mesaj kerd vila. Yaşar Kayay vat: "Qetlîamê Helebçe berde-wamê qetlîamanê Agîrî, Zilan, Qoçgîrî, Şêx Seîd û Dêrsimî bî. Qetlîamê ke, ê rojan de kurdan sero viraziyay iyê ewro jî hewna ramenê û ewro serdestan heme cayê Kurdistanî kerdo golê gûnî".


ERNK'a Ewropa jî, mesaj kerd vila. ERNK dazanayin ke; Mijo ke qetlîamê Helebçe sera wo, hewna vila nêbiyo. ERNK, wast ke; wa dinya bêvengiyê xo bêxerepno. Iraqî çekên kîmyewî dewletanê Ewropa û Amerika ra giroti bî. ERNK, mesajê xo de waşt ke wa Yewîna Neteweyan (BM) başûr bigiro binê ewletiya xo. Des hezaran kurdê penaberî (multecî) her tim benê hedefê vardayanê PDK û Dewleta Tirk. Yewîna Neteweyan, biryarê ke seba penaberanê şaranê binan gena û ana'ca, wa seba kurdan jî bigêro û biyaro ca.

Kiştî bîn ra Qetlîam, Stenbol de jî

Meydanê Beyazitî de ame şermezarkerdin. Şêlik, meydanê Beyazitî de, miyanê çemberê polîsan de qetlîamê Helebçe û hewt wendoxê ke hetê faşîstan ra kişyaybî, têdir protesto kerdî. Şêlik, pankartê ke sero "Ca: Helebçe. Tolhildan: Sondê ma wo" û "Hesawê 16'ê adarî yo bipersiyo" nûşte bî kerdî a. Şêlik bi eştinê sloganan, çepek û tilîliyan rayde wurdî qetlîamî jî protesto kerdî. Peynî protestokerdinê de xeylê kesî hetê polîsana girotiyay binçim.

Enqerê de jî bi tewrbiyina xeylê wendoxan qetlîamî amey şermezarkerdin. Pankarta "Faşîzm vizêrî Helebçe de ewro Lice de" ya kewtî meydanê Zankeyê kampusê Cebeciye Enqerî û slogana "Xwîna Helebçe li erdê namîne" ya peyniya çalakiya xo ard.

Amed de jî, banê HADEP de tewrbiyînê xeylê şelligiya jew pêserameyîn viraziya. Pêserameyîn de Terteleleyê Helebçe sero xeylê qisey vajiyay. Serokê HADEP'a şaxê mabendî yê Amedî Mansur Reşitoğlu wina vat: "Tertele-



peyra dinya pêro bêveng mend. Bi qandê Saddamî û hêzanê împeryalîstan, xayinê kurdan jî eno qetlîam ra verpersê".

Zew bîn jî, temamê sûkanê Kurdistanê vakur de û di pêro bajar û bananê Partiya Demokrasiya Şarî de terteleley ser, kombiyayînî viraziyay û şarî Saddam û embazê ci, zey Frankoy, zey Hitlerî, zey Musolînî û zey kor Mistoy ardî xo vîrî û lanet varna nê kiştöxan ser.

MABENDÊ VENGÛVAZAN

ÜLKEDE

Ji Gündemê

14 adar 1998 şemî

DEMOKRASIYA BRİFİNGAN

Leşkeran, berî 28'ê reşemiyê û piştî wê dabûn kesên ji pişeyên cur bi cur ji rojnamevanan bigire heta bigihêje hiqûnasan. Di van brîfîngan di çarçoweya konseptê ewlehî ya neteweyî de li dervehiştina kurdan û siyasetvanên islamî hatibû xwestin. Bi vî awayî rê li ber Refah-yolê hate girtin û hikûmeta Anasolê bi destê leşkeran hate avakirin. Wan bi hinceta 'irticayê' dîsa dest bi brîfîngan xwe kir. Leşkeran bi vî tewra xwe li Tirkiyeyê demokrasiya brîfîngan afirand. Leşkerên ku bersiva ku hêvî dikir ji Anasolê nestand, bi Cîgirê Serokwezîr Ecevit dest bi brîfîngan kirin.

Serokê duyemîn yê Serkaniya Giştî Org. Çevik Bir, ku di 18'ê reşemiyê de çû serlêdana Ecevit, hesasiyeta leşkeran a ji bo tîrsa 'irticayê' anî zimên. Bir, nerihetiya xwe ya li dijî cemaeta Fetullah Gülen jî anî zimên û xwest ku rê li ber çalakîyên cemaetê bigirin.

NIRXANDINA HEFTEYÊ

Manşetên rojnameya Ülkede Gündemê wêneya vî erdnîgariyê nîşan didin. Ev wêneya, digel kêma tîştên asayî, gelek tîştên ne-asayî jî di nava xwe de dihewîne. Jixwe rojnamegeriya ku xebatkarên vî rojnameyê dikin jî, ne rojnamegeriyêke asayî ye.

Di rewşêke asayî de editore rojnameyê jî ber ku pirtûka helbestan nîvîsandiye nayê girtin. Lê editore Ülkede Gündemê Hüseyin Karataş jî ber vî sedemê hate girtin û niha di girtîgehê de ye.

Li tu welatê demokratîk, nûçegihanên rojnameyê wekî xwepêşandêr nayên girtin. Lê nûçegihanên Gündemê hatin girtin û yek ji wan niha di girtîgehê de ye.

Dîsa di rewşêke asayî de navendên rojname û kovaran nabin yarîgeha polîsan, lê roja 19'ê mehê navenda Ülkede Gündemê bû yarîgeh ji polisên dewleta tirk. Piştî lêgerîneke dîr û dirêj, gelek tîştên di arşîva rojnameyê de hatin desteser kirin û çar xebatkarên rojnameyê hatin binçavkirin. Ev bûyer nîşan didin ku em kurd di rewşêke ne-asayî de rojnamegeriyê dikin. Jixwe haya me jî vî yekê heye, lewre rojnamegerên gelekî ku li ber xwe didê, nikare di rewşêke asayî de karê xwe bike. Ji ber vî yekê jî em dibêjin xem nake.

Lê ev dimen tîştêkî din jî nîşan didê; gotinên rayedarên tirk ên li ser demokrasiyê virên bêbinî ne. Jixwe jî berê ve hatîye gotin: Li welatêkî dagirker, demokrasiya nepêkan e.

Leşkerên ku wê 17'ê adarê brîfîngê bidin Serokomar Demirel jî duh berî civîna YÖK'ê brîfîng dan rektorên zanîngehan. Rektoran piştî vî brîfîngê ku ji aliyê Serşewirmendê MGK'ê ve hate dayîn, belavokek belav kir. Di belavoka ku weşandin de tê gotin ku ev brîfîngê rê nade xwendevanên bişarpe (türban). Di belavokê de hate diyarkirin ku, xwendekar û personelên bi peywir (wezîfe) mecbûr in ku li gorî van zagonan bimeşin.

15 adar 1998 yekşemî

ÖCALAN: DORA BAYKAL E

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, got ku çavkaniya lêgerîna rêveberiya ne-asayî (ara

rejim) ku van rojên dawîn qala wê tê kirin, DYA ye. Öcalan îfade kir ku di bingeha kêşeya û lêgerîna nû de kêşeya kurd heye û wiha berdewam kir: "Li gorî min DYA'yê pê li frênê kir. Wê jî artêşê re got, 'Ecevit-Yılmaz baş nikarin vî karî bimeşînin, lêgerîneke nû divê' û mesaja vî lêgerîna nû da."

Öcalan got ku "Serokê CHP'ê Deniz Baykal xwe ji serdema nû re amade dîke. Baykal nêzî ekola Amerika yê ye, dibe ku wî jî ew helwest fêm kiribe. Ez di wê baweriyê de me ku Baykal ev mijar jî hilgirtiye." Abdullah Öcalan, ji bo pîrsa "Hûnê piştîgiriya bidin Baykal" ev bersiv da: "Li gorî wê wê kî piştîgiriya bide kê? Em di politikayê de yek ji hêzên sereke ne. Baykal hêzeke di rêza paşîn de ye, ancax ew dikare piştewaniya me bike."

19 adar 1998 duşemî

GULE CAN STAND

Teqemeniyên ku leşker li ristan dihêlin hîn jî mirovan dikujin. Li Liceya Amedê di çopa Dibistana Mecanî ya Perwerdehiya Seretayî ya Herêmî de ku tabûr ji xwe re wekî qijleyê (kışla) bi kar tîne, guleyek teqiya. Bi navê Engin Ceylan (14) zarokêkî jiyana xwe ji dest da, Mehmet Karadağ (13), Hüseyin Boğar (13) û Abdullah jî bi xedarî birîndar bûn.

Termê Engin Ceylan bi beşdariya girseyêke mezin hate veşartin. Mehmet Karadağ, Hüseyin Boğar û Abdullah ku di teqînê de birîndar bûn, rakirin Nexweşxaneyê Fakûlteya Zanîngeha Dicleyê. Hate ragihandin ku Hüseyin Boğar û Abdullah (...) ji nexweşxaneyê derketine, lê Karadağ wê demeke din jî

bê tedawîkirin.

Mehmet Karadağ diyar kir ku ew car caran diçin, li ser çopê hesinan berhev dikin. Karadağ bûyer wiha vegot: "Gava Engin çop tev dida, got 'min hesinek dît.' Me berî wî çaxî hîç tîştêkî bi wî rengî nedîtibû. Me fêma nekir bî çî bû. Engin hesinê di destê xwe de avêt û bi avêtinê re teqînek ku guhê mirov ker dikir, çêbû."

17 adar 1998 sêşemî

LI HELEPÇEYÊ BİRANÎNA GIRSEYÎ

Li Helepçeyê tevkujiya ji aliyê Lhêzên Seddam ve ku di 16'ê adara 1988'an de pêk hatibû, di 10'emîn salvegera xwe de, ji aliyê bi 10 he-

ku li Başûrê Kurdistanê jiyana xwe di domînin wekî mexdûrên şer bîna nasîn û her wiha zagonên ku NY jî bo pir gelan xistiye rojeva xwe, ji bo mexdûrên şer ên kurd jî bîna xebitandin.

18 adar 1998, çarşemî

GEL JI NEWROZÊ RE AMADE YE

Gelê kurd xwe amade dîke ku îsal jî Cejna Berxwedana Neteweyî Newrozê bi xwepêşandana bîcoş pîroz bike. Li gel rênedana rayedarên herêmê jî bo pîrozkirinê ku bi hezar salan e pêk tê, gel jî bo derketina qadan amadehiyên xwe qedandin. Rayedarên HADEP'ê ku li gelek bajaran jî bo pîrozkirinê serî li walîtiyan dane, diyar kirin ku wê ew, di pîrozbahiyên de gel bi tenê nehêlin.

Wê pîrozbahî li gelek bajaran

Helikoptera Skorsky ya leşkerên tirk li herêma Deriya Xaçê ji gerilayan derbe xwar û ket.

zaran mirovan ve hate lanetkirin. Di xwepêşandana protestoyê de ku nûnerên PKDW, PKK, YNK, PSDK, Partiya İslamî ya Kurdistanê, Partiya Kedkaran jî beşdar bûn de, bi tenê nûnerên PDK'ê cih negirt. Gel, ew helwesta PDK'ê şermezar kir. Ji bo xwepêşandana protestoyî ku ji aliyê Komîteya Qurbanîyên Helepçeyê ve hate saz kirin, ji navçe û bajarên der û dora Helepçeyê, bi deh-hezaran mirov bi sibehkî re dan ser rîya Helepçeyê. Girse piştî ku li navenda navçeyê gihîşt hev, hêta 'Goristana Qurbanîyên Helepçê' meşiya. Di meşê de li dijî rejîma Iraqê, DYA'ya ku ji Iraqê re silêhên kimyewî peyde kiribûn û welatên rojavayî diruşme hatin avêtin. Li bajarên Tirkiye û Kurdistanê jî protestoyên qetlîama Helepçê û qetlîama zanîngehe ku di encama bombekirinê de roja 16'ê adarê 7 xwendekar hatibûn kuştin, bûn yek.

ERNK: BILA DINYA BÊDENGİYA XWE XIRA BIKE

Nûnerê ERNK'ê yê Ewropayê diyar kir ku hîn mîja li ser Komkujiya Helepçeyê belav nebûye û bêdengiya dinyayê ya li dijî komkujiyê şermezar kir. ERNK'ê xwest ku 10 hezar penaberên

bi partiyên siyasî û rêkxistinên din re pêk werin. HADEP'ê jî bo bihevê pîrozkirina Newrozê bangî her kesî kir. Di bangê de jî her kesên alîgirê ked, aşî, demokrasî û azadiyê hate xwestin ku beşdarî pîrozbahiyê bibin û wiha hate gotin: "Werin em stranên xwe bi hev re bibêjin, em bi hev re têkevin dîlanê. Werin em nîrxên xwe yê jiyana û tîkoşîna xwe bi hev re bilind bikin."

DI HEREKETA BESTAYÊ DE HELİKOPTERÊK KET

Operasyona leşkeran a li ser herêma Bestaya Şirnexê bi dawî bû. Helikoptereke Skorsky a operasyonê li Elkê (Beytüşebap) li herêma Deriyê Xaçê, di dema daketîna de ji doçkaya gerilayan derbe xwar. Hate ragihandin ku helikopter piştî ku agir pê ketiye, ji herêmê dîr ketiye û li nêzîka Qilaban ketiye. Helikopterên din jî mecbûr mane ku bi şûn de vegerin. Li gorî ragihandinan li çolteran di navbera gerîla û leşkeran de şer derketine û ji cerdevanên gundê Girêhêne M. Salih Yıldırım, du tîmên taybet û gelek leşker hatine kuştin. Leşkerê bi navê Şaban Ertaşan û cerdevanên bi navê İzzetin Yıldırım û İbrahim Aydemir jî ji aliyê gerilayan ve dîl hatine girtin.

